



TÊKOŞER



HEJMAR 34

KANÛN 1986



revue trimestrielle

driemaandelijks blad

TEKOŞER: KOVARA TEKÖŞER, YEKİTIYA KARKER Û XWENDEKAREN KURD LI BELÇİKA

NAVNIŞAN: rue BONNEELS, 4 - 1030 BRUXELLES - BELGIQUE

TEL: 02/230.89.30

NAVNIŞANA POSTE: B.P. 33 - 1730 ZELLIK - BELGIQUE

BUHA: 50 F.B.

N° BANKÊ: 426-3144071-85 - K.B. - BELGIQUE

BERPIRSIYAR: M. Nezh YALÇIN

KOMÎTA NIVÎSKARIYÊ: Ahmed, Derwêş, Pervîn, Yalçin

N A V E R O K

DEWLETA TIRK DIXWAZE KERKÖK Û MÖSILE IŞGAL BIKE	Derwêş	R. 3
RÊZIMANA KURDÎ (VII), Kîte û damezrana dengî ya gotin ..	C. BEDIR XAN û R. L..	R. 4
KÖRTLERDE SANAT (II), Mannai	Nêrgiza TORÎ	R. 8
HELBEST: Ji dîwana MELEYÊ CIZÎRÎ (1145?-1160?)		R.11
İÇE KAPANMAK DEĞİL, DIŞA AÇILMAK	Dogan OZGUDEN	R.13
DÎROKA KURDISTANE DI ANSİKLOPEDIYA İSLAMÊ DE (VII), Ji 1650 heta 1914-18		R.16
ZIMANE KURDÎ (III), Nexşê zaravên kurdî	Fuad Hama XORŞİD	R.23
PIRSA ERMEYAN LI PARLEMENTOYA EWRUPA	Jaak VANDEMEULEBROUCKE	R.28
XEBATA ME		R.30
TEKOŞER'DEN HABERLER		R.31

S O M M A I R E

L'ETAT TURC VEUT OCCUPER KIRKUK ET MOSSUL (Kurdistan d'Iraq)	Derwêş ...	P. 3
GRAMMAIRE KURDE (VII), La syllabe et la structure phonétique du mot - B.X.,L.		P. 4
L'ART CHEZ LES KURDES (II), les Mannai	Nêrgiza TORÎ	P. 8
POEME: Du Recueil de MELEYÊ CIZÎRÎ (1145?-1160?)		P.11
NE PAS SE RENFERMER, MAIS S'OUVRIRE A L'EXTERIEUR	Dogan OZGUDEN	P.13
L'HISTOIRE DU KURDISTAN DANS L'ENCYCLOPEDIE DE L'İSLAM (VII), 1650 - 1914-18..		P.16
LANGUE KURDE (III), Carte des dialectes kurdes	Fuad HAMA XORŞİD	P.23
LA QUESTION ARMENIENNE AU PARLEMENT EUROPEEN	Jaak VANDEMEULEBROUCKE	P.28
NOS ACTIVITES TRIMESTRIELLES		P.30

DEWLETA TIRK DIXWAZE KERKÛK Û MÛSILÊ ÎŞGAL BIKE

Derwêş

Bi awakî vekirî xuya ye ku rejîma Begda-dê her roj qelstir dibe. Ji alîkî êrîşên leşkerê Xumeynî li Başûrê Iraqê û ji aliyê din şerê hêzên Kurd ku li Kurdistanê dest dane hev (li Kurdistan Press, hejmar 5 binêre) rewşa rejîma Baas ji her alî qels dikin.

Gelo çi dibe ger rejîma Baas bikeve? Di mehên dawîn de, bi awakî vekirî em dibînin ku dewleta Tirk dixwaze têkilî şerê Iran û Iraqê bibe. Heta dibe ku ew planên êrîşeke leşkerî bo Kurdistanê Iraqê çêdike. Mebesta (meqsed) wê ew e ku berî hilweşandina Baas ji aliyê Kurdan û Xumeynî xwe bighîne navçeyên petrola Kerkûk û Mûsilê.

Dewleta Tirk, di dawiya Gulana 1983 de êrîşeke weha bi amanca "xelaskirina wilayeta Mûsilê" biri bû ser hêzên pêşmergan li Kurdistanê Iraqê. Hînga jî vê dewletê behana "tehlîka Kurdan" ji bo wê amanca xwe bi kar dianî. Dewleta Tirk bi vê behanê dixwest ku xewna xwe a dîrokî bîne cî, petrola Kerkûk û Mûsilê îşgal bike.

Di rojnama The Times a 28 Gulan 83 de nivîsarek li ser vê pîrsê hatiye nivîsîn. Li gora vê nivîsarê xuya ye ku planên êrîşeke leşkerî ji aliyê dewleta Tirk û Amerîka amade bûye ku Kurdistanê Iraqê îşgal bikin. Lê ji ber ku danûstandinên Tirkîye û Iraqê ne xirab bûn ev plan hê bi tevayî ne hatiye bi cî kirin. Bê gûman, di dema ku rejîma Iraqê ber bi ketinê biçe de, ewê dewleta Tirk bi alîkariya Amerîka û endamên NATO mihawela îşgala wê perça Kurdistanê bikin.

Li gora rojnama Ingilîzî The International Herald Tribune a Mijdar 1986, paş bombekirina balafira Israîl di Nîsanê de, hikûmetên giring ên Awrupa û Amerîka bawer in ku Sûriye alîkariya terorîstên Lubnan, Filistin, Iran û Ermenî dike. Amanca terorîstên Ermenî Tirkîye ye. Sînorên Tirkîyê jî bi Yekîtiya Sovyet ve me, û ew jî piştî Sûriyê digre. Di eynî demê de, welatekî misilman di şer de ye. Du dewletên cîran ên Tirkîyê, Iran û Iraq ji şeş salan û vir de di şerekî mezin de ne. Û pîrsa Kurdan li her çar dewletan heye û dewleta Tirk jixwe ditirse.

Di vê dewra dawîn de, leşkerê Xumeynî bi alîkariya hêzên Kurdên Iraqê êrîşên mezin dibin ser leşkerê Baas. Êrîşên wan nêzî navça Kerkûkê bûne. Tirkîye jî beşekî mezin ji petrola xwe ji Kerkûkê destîne. Ew jî dikeve tehlikê. Li gor hikûmeta Ankara mimkin e ku Iran û Kurdên Iraqê di şerê xwe de biserkevin. Ji vo vê yekê ew planên xwe bi alîkariya Amerîka ewha dike. Eger Iran û Kurdên Iraqê biserkevin û hêzên Baas bê çare bimînin, leşkerê tirk, berî leşkerê Iranê û hêzên Kurd, ewê bikeve Kurdistanê Iraqê û navça petrolê ya Kerkûk û Mûsilê îşgal bike.

Bi vê yekê, ewê Yekîtiya Sovyet Tirkîyê protesto bike û bixwaze ku ew leşkerê xwe bikişîne. Amerîka jî wê dijî vê protestoyê û daxwazê derkeve. Amanca vê alîkariyê ne parastina Tirkîyê ye, lê parastina petrol û kontrola vê navçe ye. Ji ber ku ew navçe stratêjîk e. Hin welatên rojava jî piştî Tirkîye û Amerîka digrin.

Di rojnamên Tirkan de ev planên dewleta Tirk xweş xuya dibin. Ew dibêjin ku xwestina navçên Kerkûk û Mûsilê pîrseke dîrokî ye, ev navçe ya Tirkîyê ne. Mafê xwestina wan tişteki taybetî ye. Ger navçên Kerkûk û Mûsilê ji destên rejîma Iraqê derkevin zerereke mezin li Tirkîyê dibe. Mimkin e ku Kurd û Iranî petrolê yan nedin Tirkîyê yan jî kêmtir bidin. Mimkin e ku ew her du hêz xêza petrolê ya ku ji Kerkûkê dirêj dibe nav sînorên Tirkîyê bibirin. Ev xêza petrolê di salê de 300 milyon dolar dixê kodika dewleta Tirkîyê. Dema ku rejîma Baas li Iraqê bikeve, mimkin e ku Kurdên Iraqê mafên xwe yên netewî li Kurdistanê Iraqê wergirin û statuyeke nuh bistînin. Ew yek jî ji bo Tirkîyê tehlikeke mezin e. Tirkîye naxwaze bikeve bin tirseke weha. Dema ku Kurdên Iraqê statuyeke din wergirin, ewê Kurdên Tirkîye û Iranê hê bihêztir bibin û şerê xwe xwestir bikin.

Ji aliyê din de, riya International ku ji Kurdistanê dibihure dikeve bin tehlikê. Ger ew bikeve bin destên Kurdan, hemî kontrola çûn û hatinên bazarî ewê bikeve bin destên Kurdan. Ev yek jî bi xweşiya Tirkan naçe. Di rewşeke weha de, pîrsa Kurdan di warê International de ewê baleke mezintir bikişîne.

Ji ber van sedemên jorîn e ku ji sala 1979 û vir de lihevhatinek di navbera Tirkîye û Iraqê de çêbûye. Ev lihevhatina wan li hemberê "tehlîka Kurdan" bû. Li ser bingeheê vê lihevhatinê ev çend car e dewleta Tirk bi hezaran leşkerê xwe dişîne ser hêzên Kurdistanê Iraqê. Li ba leşkerê xwe, bi balafiran gund û bajarên Kurdan bombardîman kirin û xelkê êşand. Hikûmeta Iraqê jî ji bo vê alîkariyê spasdara dewleta Tirk e.

Cara dawîn ku Tirkîye leşkerê xwe şand ser Kurdan di Tebaxa 1986 de bû. Ji hînga ve, li ser vê pîrsê li Ankara bi awakî giring tê axaftin û planên nuh tên çêkirin. Yek ji van planan ev e ku Tirkîye vê pîrsê weka ya Qibris hal bike. Ew dixwaze ku êrîşeke leşkerî bibe ser vê navçe û li wira komareke "serbixwe" flân bike. Lê berpirsiyarên hikûmetê di nav xwe de hê ne gihane biryareke mişterek.

Lê ger ew tecawuzeke weha bikin, ewê gora xwe bi xwe bikolin. Ji alîkî ewê hêzên Kurdistanê Iraqê berê çekên xwe bidin dewleta Tirkîyê û bi hemî hêza xwe mihaweke bikin ku dewleta Tirkîyê ji hindirû malmîrat bibe û ji aliyê din ewê dewleta Tirk di cihanê de ji gelek aliyan tenha bibe.

R Ê Z Î M A N A K U R D Î

(Z a r a v ê K u r m a n c î)

- VII -

Mîr Celadet BEDIR XAN û R. LESCOT (*)

IV. K Î T E (1)

Û DAMEZRANA DENGÎ YA GOTIN

56. Di kurdî de kîteyên dirêj û kîteyên kurt, ku her du jî dikarin vekirî yan girtî bin, hene. Kîteya kurdî li gora awayên jêrîn pêk tê:

- a) Dengdêreke kurt yan dirêj (e, ê, a-gir, e-nîşk).
- b) Dengdêreke ku li pêşiya wê dengdarek heye (ba, pê, re, gi-rav, te-hil, pe-re)
- c) Dengdêreke ku di dû wê de yek yan gelek dengdar tên (ar, om, al, erd, îsk, av-sark, ar-gûşk).
- d) Dengdêreke ku li pêşiya wê dengdareke yekemîn û li paşiya wê dengdareke duyemîn hene (bar, pol, şev, bin-geh, per-gîn).
- e) Dengdêreke ku li pêşiya wê çend dengdar hene (qlê-wî, stro, sto).
- f) Dengdêreke ku li pêşiya wê çend dengdar û li paşiya wê yek yan çendên din hene (stran, stêwr, stêrk, şkeft, dran).

57. Jimara yekîteyên ku ji dengdêrên tenha pêk tên heft e: Pronavên (zemîr) "a", "ê", "e" û "î", baneşanên "o" û "ê" (lo! lê!) û gihaneka "û" (ez û tu). Em bala xwe bidin ku gava ku eva dawîn tê pêşiya gotineke ku bi dengdêrekê dest pê dike, ew carna weka "w" tê bi lêv kirin (ez û ew: Ez w ew).

58. Kîteyên ku ji dengdêreke tenê yan ji dengdêreke ku li paşiya wê yek yan çend dengdar hene ava dibin bitenê di destpêka

gotinan de yan di rewşa tenhabûnê de, ji derveyî (ji xeynî) awayê hebûna du dengdêran di dû hevdu de (li bend 63 binêre), xuya dibin. Ew kêma in. Bi rastî, tu gotineke kurdî bi "u" dest pê nake; "i"ya destpênek (a destpêka gotinê) bitenê di gotinên ku ji zimanên biyanî hatine stendin tê dîtîn (li bend 9 binêre); "e", "ê", "o", "î" û "û" gelek kêma caran di destpêka gotinên kurdî yê zelal de tên dîtîn. Bitenê "a" gelek caran erkê (wezîfe) tîpa yekemîn distîne. Lê, bi awakî giştî, ji derveyî çend gotinên ku bi "a" dest pê dikin û ku xuya ye ku ew weka xwe ji îraniya kevn hatine stendin (weka agir, av), meriv dibî-



(1) Kîte: Perça gotinekê, ku tê de çend tîp bi dengekî tên bi lêv kirin (per-çe, xa-nî). Yekîte: gotina ku tê de kîteke tenê heye (nan). Pirkîte: Gotina ku tê de gelek kîte hene (şa-re-da-rî).

(*) Grammaire Kurde, Librairie d'Amérique et d'Orient, Paris 1970. Wergerandin, fransîzî-kurdî: Pervîn.

ne ku dengdêr di destpêka gotinan de bitenê piştî ketina (hundabûna) dengdarekê, bi awakî giştî "h", xuya dibin.

Nîşe: Aş: ji "haş". Avêtin: ji "havêtin".
 Arî: ji "harî". Ajnî: ji "hajnî" (av-jankî, soberî).
 Aza: ji "haza". Evrîşim: ji "hevrişim". Ev: ji "hev" (pronav yan rengdêra pêşker "sifeta nîşandanê"). Ew: ji "hew" (pronavê siyemîn; pronav û rengdêra pêşker). Enî, anî: ji "henî". Enîşk, anîşk: ji "henîşk". Evraz: ji "hevraz" (kêleka çiya yan dereke bilind a berejêr). Eş: ji "hêş". Evar: ji "hêvar". Evrîst: ji "hevrist" (celebeke dar). Ibret: ji "hibret" (ji erebî: عبدة). Iflas: ji "hiflas" (ji erebî: إفلاس). Isbat: ji "hisbat" (ji erebî: احسب). Îro: ji "hîro". Îcar: ji "hîcar". Îsal: ji "hîsal". Oste: ji "hoste". Ûr: ji "hûr". Ûçik: ji "hûçik" (milên fireh û dirêj ên kirasê kurdî).

59. Gotinên kurdî gelek kêrbar bi kîteyên vekirî diqedin. Evên dawîn bi awakî giştî dengdêreke dirêj yan "e", dema ku pêwist be, distînin. Hebûna "i" yan "u" di dawîya gotinekê de pirr îstisnâf ye (li bend 9 û 10 binêre). Xuyabûna dengdêreke weka tîpeke dawîn a gotineke kurdî ya zelal di piraniya caran de encama (netîce) ketina dengdareke dawîn yan dengkî hevgirtî ye.

a) Ketina dengdareke dawîn:

"Ro" dêlva "roj". "Serşo" dêlva "serşok" (hemam). "Fire" dêlva "fireh".

b) Dengê hevgirtî:


"Pê" dêlva "pey". "Tirî" dêlva "tirih". "Gilî" dêlva "gilih" û hwd. (li bend 71-75 binêre).

Nîşank. Lê, çend paşdaniyên kurdî ji dengdêrekê ava bûne yan jî pê diqedin (li fêsl XXIV-II binêre):

60. Kîteyên ku bi çend dengdarên destpênek dest pê dikin piraniya caran bi awakî tenha (yekîte) yan di destpêka gotinên pirkîteyî de xuya dibin (nîşe: Standin, frotin). Meriv wan di rata (bi tirkî: Durum) duyemîn yan siyemîn de bitenê di gotinên hevedudanî de dibîne (nîşe: Vexwendin "ezimandin", rîspî "pîr, kal").

Nîşank. Di gotinên hevedudanî de, bi hêzanî gava ku ew ji dûbarebûna (tekrar) gotinê bi xwe pêk tînin, meriv gelek caran xuyabûna dengdêrekê di navbera wan de dibîne. Ev dengdêr jî bo veqetandina tofên (kom) her du dengdaran hatiye danîn.

Nîşe: Giregir (gir-gir). Keskesor (kesk-



sor). Hişkeber (hişk-ber) "avahiyên ji kevirên zuha". Deverû (dev-rû) "gava ku meriv li ser zikê xwe xwe dirêj dike".

61. Gotinên kurdî pirr kêrbar tofên du dengdarên destpênek, û bi awakî pirr îstisnâf tofên sê dengdaran, distînin. Lîsteyên gotinên ku me karî bû heta nûha pêk bînin (lê ku bi taybetî kêrbar in) hiştin ku em bitenê awayên jêrîn derxînin:

1° Tofên du dengdarên destpênek:

B-l, b-r: Blêç (brûska ku dikeve erdê); blûr; brandox (pale); branguh (hêka si-piyan); braştin; brûsk.

D-r: Dran.

F-r: Frotin; frûmaye (adî).

J-m: Jmartin.

P-r: Prot (merivê ku şerbikan "cerran" çêdike yan difiroşe).

Q-l, q-r: Qlêwî (merivê ku xwe davêje nav avê); qrêj; qrên (pevçûn).

Q-p, s-t: Di gelek nîşeyan de, û ji wan: Spas, spehî (xweşik), spî û hwd., sto (stû), stûr, stêrk û hwd.

Ş-k, ş-t: Şkevik (sehena kûr), şkevandin (şikandin), şkêr (koma kovirên piçûk), şkevlatok (kîso), ştiyar (tiştê ku devê wî vekirî ye), ştehilîn (peyivîn).

T-r: Traştin (jêkirin, tûj kirin).

Z-m: Zmanok (zimanê piçûk ê ku di dawîya dev de ye).

Di dawiyê de, tofên destpênek ku ji tîpên qirikî û "w" pêk bûne ev in: Gwîz, hwîr (hûr), kwîr (kûr), qwîz (lawirekî "heywan" ku nêzîkî rûvî ye). Xwîn. Tofa x-w bi taybetî pirr tê bi kar anîn (li bend 30 binêre).


Nîşank I. Lê divê ku em bala xwe bidin ku di gelek peyvikan de, "i"yek tofên du dengdarên ku me di nîşeyên buhurî de dîtin vediqetîne.

Nîşe: "Zîman" dêlva "zman": "Şikeft" dêlva "şkeft", "bîra" dêlva "bra".

Ango, her du awa di zimanê nivîsînê de tîn pejirandin (qebûl kirin).

2° Tofa 3 dengdarên destpênek:

Ev tof bitenê hat dîtin: S-t-r: Stran, strî, stro (qiloç) û yên weka wan.



Nîşeyên ku me gotin dihêlin ku meriv bibîne ku bitenê dengdarên girtî (ji derveyî yên qirikî "g" û "k") û fîkînî (j, ş, s, z) dikarin di destpêka tofeke dengdarên destpênek, ku ya duyemîn bitenê "w" ye, de hebin. Regezê (unsur) duyemîn ê gotina hevedudanî her gav tîpeke herikî ye ("r" yan "l"), piştî tîpên girtî ("m", "t" yan "k"), yan tîpeke girtî ye, piştî tîpên fîkînî.

NîşANK II. Lê em bala we bikişînin ku di rewşa îroyîn a lêgerînên kurdî de, encamên (netîce) jorîn nikarin mutlaq bin. Û di her awayî de, ew bitenê ji bo kurmançî dibin.

62. Kîteyên ku bi tofeke du dengdaran diqedin gelek in.

Nîşe: Rind, berf, bilind, pirs, ferş (zina-ra pan), tirş.

Eger nîşeyên ku heta nuha hatin nîşan dan bihêlin ku em hukmekî mutlaq bidin, em bala xwe bidin ku yekemîna van her du dengdaran tucar girtî nabe. Ji derveyî "w" û "y", hemî dengdar dikarin di van tofan de bikevin rata duyemîn.

Nîşank: Tofa yekta ya sê dengdarên dawînek, ku heta nuha hatiye dîtin, "-rşk", di "avtîrşk" de ye.

63. Dengdêrên rasthatî (bi ransizî: Hiatus) Dengdêrên rasthatî ku ji rasthatina tesadufî, di hundirê hevokekê de, ya dengdêrên dawînek û dengdêrên destpênek pêk tînin ne kêm in.

Nîşe: Hate ava kirin, mala apê min, bihayê êzing.

Nîşank I. Em bala xwe bidin ku, gava ku yekemîna van her du gotinên ku rasthatina wan dengdêra rasthatî pêk tîne, eger daçek (bi, li, ji...), pronav (zemîn), rengdêra pêşker (sîfeta nîşandanê: ev, ew, vî, wî...) ya yekîteyî be, dengdêra wê ya dawînek ber bi hundabûnê diçe.

Nîşe: Vê êvarê: v'êvarê. Bi izna te: b'izna te. Ji aliyê din: j'aliyê din.

Di hundirê gotinan bixwe de, dengdêra rasthatî pirr kêm tê dîtin. Sedemên hebûna wê her gav ev in:

1° Ketina dengdarekê di hundirê gotinên ji rayê (esl) îranî.

Nîşe: Paîz: ji "pehîz" yan "payîz". Roava: ji "rojava".

2° Ketina ξ yan ς di gotinên ku ji erebî hatine stendin.

Nîşe: Siûd (bi erebî سِدود). Iane (إِئَانَة). Qaîl (قَائِل). Mîamele (مِئَامِلَة).

3° Rasthatina tesadufî ya du dengdêran di hundirê gotineke hevedudanî de.

Nîşe: Dilbîêş, Bêesas, diajo (alîkarê şivên).

Nîşank II. Dengdêra rasthatî bitenê ji demeke kurt de hatiye pejirandin. Bi rastî, di piraniya caran de, zîman tecrube dike ku jê dûr bikeve, yan bi xistina dengdêrekê (nîşe: Ketina "i"ya berlêkerên "di" û "bi" di kesandina "tesrîf" lêkerên ku bi "a" yan "ê" dest pê dikin de), yan jî bi bikaranîna dengdareke girêdanê (nîşe: "y", li ber parek "veqetandek" û nîşandekên awayan).

64. Dûbarebûn. Dûbarebûna dengdaran di kurdî de nayê pejirandin. Dema ku du dengdarên wekhev (nîşe: du "t", du "l", du "d" û hwd.) di dû hev de tînin, bitenê yek ji wan tê bi lêv kirin.

Nîşe: "Xurtir" dêlva "xurttir", ji "xurt". "Rastir" dêlva "rasttir", ji "rast".

"Paşîv" dêlva "paşşîv" (xwarina şevê)
 "Başev" dêlva "başşev". "Yekîte"
 dêlva "yek-kîte".

Weka ku ev nîşe nîşan didin, ketina dengda-
 ra duyemîn di nivîsînê de xuya dibe, dema
 ku ew bi awakî hergavî (daimî) di gotineke
 hevedudanî yan bipaşdanî de hebe.

Di vajayê (eks) vava de, dema ku meriv di
 hevokekê de rasthatina tesadufî ya du goti-
 nê ku yekemîna wan bi dengdareke ku di
 destpêka gotina duyemîn de jî xuya dibe
 bibîne, di nivîsînê de tu guhertin çênabe:

Nîşe: "Di gund de", lê "di gun'de" tê bi
 lêv kirin.

"Ji gayê gewir re", lê "ji gayê
 gew're" tê bi lêv kirin.

"Dengbêj jî hene", lê "dengbê'jî
 hene" tê bi lêv kirin.

"Ev her du gund bi hev re ne", lê "ev
 her du gund bi he've ne" tê bi lêv
 kirin.

65. Li gora rêzika (qaîde) ku di benda
 jorîn de hat gotin, dema ku rasthatina du
 dengdarên cihê dibe sedema asîmîlasyona yek
 ji wan ji aliyê ya din, a ku dimîne tucar
 dûbare (tekrar) nabe.

Hundabûna dengdara asîmîlekirî di nivîsînê
 de bitenê dema ku ew bi awakî hergavî di
 gotinê de hebe xuya dibe (gotinên bipaşdanî
 yan hevedudanî).

Nîşe: "Pişdawî" dêlva "pişt-dawî" (vejiyan,
 piştî mirinê). "Rintir" dêlva "rind-
 tir". "Dewlementir" dêlva "dewlemend-
 tir".

Lê meriv "ez ji kû zanim" dinivîse û "e'ji
 kû zanim" dixwîne.

66. Guhertina cihên tîpan yan kîteyan di
 hundirê gotinê de (bi fransîzî: Métathèse).
 Ev diyarbûne (hasida tebîî) gelek dûbare
 ye (gelek caran dibe). Emê jê çend nîşeyan
 bêjin: "Dergistî" dêlva "desgirtî", ji
 "destgirtî". "Nîrvo" dêlva "nîvro". "Befir"
 dêlva "berf". "Qehbik" (ji riha erebî
 "qubh" **قُبْه**).

Di dawiyê de, emê guhertina gotina "hevrî-
 şim" bibînin (awayên din: hevrêşim, hevrû-
 şim), bi farisî "Ibrîşim" **اَبْرِشِم**. Ev gotin bi
 guhertina cihê tîpan dibe: "Hevirmêş", û
 paşê "hermîş", "harmîş", "ermîş".

Dûmahî heye

S.BRAHIM

GULÎSTANA ZIMAN

سلسلة تعليم اللغة الكردية

1

2594 k
 1982 m

**Hokirina Zimanê
 Kurdî 1**

Şahîn Hokir

KÜRTLERDE SANAT*

-//-

Nêrgiza TORİ

MANNAİLER

Mannai'ler Ari ırkından bir ulustur. (M.Ö:-2000) yıllarından önce Urmiye Gölünün güneyinde yaşıyorlardı. Assur savaş belgelerinden ve hükümet bildirilerinden anlaşılacağına göre Urmiye Gölünden Kürdistan dağlarına (Zagros) kadar olan bölgeye Mannai bölgesi deniliyordu. (bak harita:1)

Mannai'ler Hurri'lerin torunlarıdır.(*). Komşuları, merkezleri (M.O:8.) yüzyılda Van Gölü çevresinde olan Urartu'lar idi. Med'ler, Urartu ve Assur'larla birlikte (M.O:7) yüzyıldan başlayarak Akbatan (Hamadan)'da bu devrin üçüncü büyük devletini kurdular.

Mannai'lere ilk kez Assur kralı Salmannasar III.'ün (858,824) güneydeki ve doğudaki sınırlarını genişletmek için yaptığı ataklardan gönderdiği belgelerde rastlıyoruz. Aynı zamanda Urartu kralı Menua'nın (M.O:810-781) yaptığı akınların yazıtlarından Mannai adına rastlıyoruz. Bu zamanda Mannai'lerin başkenti Hassanlu tamamen yıkıma uğramıştı.

Hassanlu (**) bölgenin en küçük şehirlerindendi. Bu şehir yüksek bir sur ile çevrili idi. Bu sur belki de şehir idarecilerinin veya toprak sahiplerinin oturduğu merkez bölgeyi çevreliyordu. Çevredeki tüccarların ve çiftçilerin oturduğu evler ve mezarlar ise sursuz idi. Savaş anında buralarda oturanlar kalenin içine kaçıyorlardı. Kalenin duvarları 9m yüksekliğinde ve 2,7 m kalınlığında idi. Otuz metrede bir surun üstünde kuleler vardı. Bu kulelerin arasına çeşitli aralıklarla duvarı desteklemek için destekler konulmuştu. Bu çeşit duvarlara Urartu kalelerinde de rastlıyoruz.

Şehrin yolunu ana yola çıkaran batı tarafındaki kapı iki kule tarafından korunmaktaydı. Kulenin kuzeybatısına düşen bölgede




M.Ö:8 asırda ziviye'den ellerini önde kavuşturmuş olan bir adamın heykelciği. Bu heykelcik fildişiendendir. Yüksekliği:20 cm. genişlik 6,6 cm., Cincinnati Art Museum.

(*) Edith Porada, Het Oude Perzie, sayfa 128'den alınmıştır.

(**) Hassanlu adı, tarihte Hazzanlu olabilir. Oysa Hazzanu ismi Hurri'ler tarafından belediye başkanlarına verilen bir isim idi. Bu isim diğer yandan bu şehrin eski bir Hurri şehri olduğunu ortaya koyuyor. Bu şehir şimdiki Sakiz bölgesindedir ve bu bölgede Şikak adında büyük bir Kürt aşireti yaşamaktadır (Yazar).

* Bu yazı "Kürt'lerde Sanat"(1986 - Stockholm) adlı kitaptan özetlenmiştir.



iki bina ortaya çıkarılmıştır. Mannai bölgesi yağmacılar için çekici bir bölge idi. Bu nedenle tüm tarihi boyunca Mannai ülkesi Assur, Urartu ve kuzeydeki Ari ırkından olmayan Kimmer'lerin ve İskit'lerin saldırılarına uğramıştır. Assur kralı Salmannasar III. Urartu'larla olan savaşında yolunun üzerindeki o dönemde Mannai'lerin başkenti olan Zirta şehrini yağmalamıştır. (M.O:800) lerde git gide genişleyen kuzeybatı komşuları Urartu'lar tarafından Mannai ülkesi harap edilmiştir. Mannai'ler bir ara kuzey komşuları Kimmer ve İskit'lerle Med'lerinde desteğini alarak bir birlik kurup Assur'lara saldırarak onları yenilgiye uğratmışlardır. Mannai'ler bu zaferlerini kutlamak için Zagros'ta ki Geliyê Şin'de bir anıt diktiler. (M.O:715) lerde Assur kralı Sargon II. Mannai'lere saldırdı. Birlikte oldukları Kimmerler ve İskit'ler yardım göndermekte geçikince Sargon II. Mannai'lerin ülkesine girdi. Krallarını tutsak alarak kuzey Suriye'de ki bir kaleye sürgün gönderdi. Ne

var ki kral götürüldüğü yerde Mittani Kürtlerine sığındı.

Mannai'ler bir ara kuzey komşuları İskitlerin saldırısına uğramış ve Kaspi denizine gidebilmek için Mannai ülkesini doğal toplanma yeri yapmışlardır. İskit'lerin seflerinin Med kralı Key Aksar tarafından ortadan kaldırılmasından sonra ve Assur devleti (M.O:612) Med'ler tarafından ortadan kaldırıldıktan sonra Mannai'ler ırkdaşları olan Med'lere karışarak tarih sahnesinden çekilmişlerdir.

Mannai'lere ait sanat eserleri Taştepe ve bu tepenin batısında ki Solduz vadisindeki Hassanlu ve Sakiz'daki Ziviye sehrinden çıkarılmışlardır.


Eğer bu gün Urmiye Gölü'nün doğusu ve güneyi Kürdistanın diğer bölgeleri gibi Kürtlerin egemenliği altında değil ise, bu demek değildir ki tarihini kısa da olsa verdiğimiz Mannai'lerin sanat ürünleride Kürt'lerin kültür mirası değildir. Tarihin tanıklığı ve mevcut tarihi belgeler ortada iken bunların aksine ileri sürülen savlar, hafife alınmaktan öteye geçemez.



M.Ö:8.7 asırda ziviyeden Aslan başları olan
bir bilezik: açıklığı: 9 cm. New York,
Metropolitan Müzesi.



M.Ö:8.7. asırda ziviyeden boyanmış şekil-
lerde süslü bir toprak vazo. Yüksekliği:
43,5 cm. Metropolitan Müzesi, New York.



M.O:12-10 asır Hassanlu'da bulunan altın
kaseinin üstündeki şekillerin detayı.
Yukarıda:savaş arabası bir boğa tarafından
çekilen gök tanrısı.
Altta:bir dağ canavarıyla olan kavga.

Jİ DÎWANA MELEYÊ CİZÎRÎ (1145?-1160?)

Sef sef turk û moxol du k'eş û hindî li kemîn,
Bi eceb hatne cengê hebeş û rom û fireng,
Mîr û kurmanç li holan qederek westane,
Lê di nivê bi sef û tîpê ereb hatne ceng.

Zorbe wê têtin ereb têk çivandin qeseb,
Qencî bi çevan me dê ceng û cidala cemel,
Şûr û rîman vêkra pence biran têkra,
Lew me dikin jêkra qîmê dikin dil di gel.

Turim bi dil û peyrevê Mûsayîm ez,
Ateşperes û nûrê tecelayîm ez,
Barê ji weelem ku xeberdarî kirim,
Iro tu bizan ademê esmayîm ez.

Înşayê ulmê li dinê çunke mi zanî,
Zanî bi heqîqet ku çî îşame ez,
Herfên reqemê lewhîê wicûda me, bixûn,
Da qencî bibînî ku çî imlayîme ez.

Mihnet û halê esîran kê li mîran erze kit,
Dê bitin pîrsê li min lew pur bi rehm û şefqeye,
Ger bipîrsit carekê xatûn li halê sixteye,
Bend û zincîr dê vebîn, cerhên di gul dê xweş bikit,
Le kû navê dîlberê dermaneê derdê bendeye.

Geh dil geh can dibên terkê te tîn,
Nikarin yexma û talanê xalet,
Meşrebê tîrkan furat û nîle kir,
Teşne leb çû terefê Osmanî xelet.

Rom û ecem ji her teref,
Ceng û suwase wan bi xef,
Hindî û zengî sef bi sef,
Hatne ber lîwayê zulf.

Sef sef me dîn hindî û zeng,
Cêngîz hat, Teymûrî leng,
Xef wan reşandin di xedeng,
Teşbîhê tîrên xan şeref,
Tîrek ji qewsê mal zirav,
Bi dil wê bavêje nav,
Xûn tê pur teşbîhî av,
Feryad û efxan sed esef.

Mûyekî ez ji te nadim bi sed Zîn û Şîrînan,
Çi dibit ger tu hesabkî mi bi Ferhad û Memê,
Te Fireng û Erebestan û Mecer têkî standin,
Celebê xweş vegerîn hatiye newba ecem.

Dil geşte, min ji dêrê naçim kenîşteê,
Mehrabê wê bi minra wer da biçine Laliş,
Mehbûbe wek stêre, govend û îşqbazî,
Têkel biçin semayê, hişyar û mest û serxoş.

Pir e'mrê min çû bi suxtey,
Lê şikir xwezim ji bextî

Lazime li sultan û mîran
Pîrskirin li halê esîran,
Em kirin armancê tîran,
Suxteye dermandeye,
Hêj nîzanim mîr dê bîrin,
Zanist em sî sal esîrin,
Çavnêrî pursek emîrin.

Iro ji nû pur ateşim,
Dîsan ji remza dîlberê,
Mecrûhî qewsî pur weşim,
Tîr dane nîva cegerê.

Tîr dan ji qewsê ewsede,
Şahzade edya şîrin qede,
Kuştine wek min çend sede,
Wê padşahê û beglerê.
Xeşmê li feqîran meke zu padşahê min,
Purse bike carek li xeta û gunahê min,
Teftîşê bi mûmê bike, er em bi xetayîn,
Hinca nêbêtin di welatî, di cehê min,
Cewra te bihêtin, û cefaya te peritin,
Qurbana te bim, guh bide carek gilehê min,
Zanî ku ji ber cur û cefayan elemin dil,
Rehmê bi gedayê xwe ke, sultan û şahê min,
Sê sale ji derd û belayê te hlakim.

Çîn girtîye ser ban û serser bi kef kef,
Xunê wê dirêjin kul şîran cemidî kef,
Dunya bûye leyilan ji lixavan diwerit kef,
Rom û ecem girtîye ew xilme sef bi sef,
Cohte moxolan hatne cengê hebeşê.

Vewestaym di ferverê,
Li ebdê xwe ke fermanê,
Di fermanê vewestaym,
Di benda xidmetê daym,
Wekî go bê ser û paym.

Heman lê dî tu çewganê,
Li ber çewgan û kaşoyan,
Ji derba turk û hindoyan,
Dibezim her wekî goyan,
Dema ew tene meydanê.

Dema ew tene bi bazî tene,
Di gel qewsê şîrazî tene,
Çi mukarin di tazî tene,
Bi de'wa tene lêk dane.

Bi de'wa tene me yexma kin,
Di a'mê sur qewxa kin.

Wê beglerê pur kuştine,
Engûşt bi xwînê riştine,
Ma ehlê dîl qet hiştine,
Sohtine mîslê mecmerê.

.....

Ma Cizirî şibhedarî textê heft îqlîm bit,
Hem bi hukim û seltenet Eskender û Fexfur bit,
Mîslî cem cama zerin xalî nebê te ji badayê,
Da ji xemra şadmanî "dayma" mexmûr bêt.

Ma di baxê îş û nûşê her bi saz û erxewan,
Kamran û kabexş û dil xweş û mesrûr bêt,
Çendeke şîrin puser derbendê dîwana te bêt,
Bendê şapûrê te bin ta Xosrow û şapûr bêt.

.....

Ney tenê Tebrîz û Kurdistan li ber hukmê elemdarê te bin,
Sed wekî şahê Xurusanê di ferwarê te bin,
Ger çî der îqlîmî rabe' hate textê sultanet,
Padşahê heft îqlîman selamkerê te bin.

Paşî newşîrwan dibê dî hakimê adil tuyî,
Mîslî Hatem dî bidanê der cihan meşhûr bî,
Ma Cizirî şubhedarî textê heft îqlîm bî,
Hem bi hukim û sultanet Eskender û Fexfur be.

.....

Rendî bi xwe qendî şîrin û şepalî,
Qencî û bi xencî û bi nazî û delalî,
Mehbûb bi textî, bi rextî, bi xwe bextî,
Umrê te mera bit sed û deh sal helalî.

.....

Dilberê, serdare, xoban, ez nîzanim agah heye,
Di hebs û zîndanê êsîr û girtîyê dermandeye,
Girtîyem, mam ez di hebsê, kî gelo mehder bikit,
Carekê navê me bînit, pur sevabek zêdeye,
Mihnet û halê êsîran kê li mîran erze kit.

.....

Sîwaş û fitneyan rakin,
Bi şîr ew tene talanê,
Dû talanê meşûr tene,
Ji mee'dana enî kafûr tene,
Di têkel zulmet û nûr tene.

Me kufrê dî di îmanê,
Ji şerqê zulmet û şam bê,
Ji zulfan enberê xam bê,
Kenarê xal û nîşanê,
Du zulfê enber efşanîn,
Du lelê şekeristanin,
Dilê min wan xedeng danê,
Dilê min wan xedeng lê da,
Di burca zuz û şeb têda.

.....

Burca ku hakim lê du mîr,
Min dî li textê keşwerî,
Textê di mîr û begleran,
Meydanê coqa gwêgeran,
Eslan û cotê meyxuran,
Mey dan şeraba saxerî.

.....

Saxer bi dest serxoş û mest,
Wextê sehergeh dest bi dest,
Xeflet û begler meyperest,
Kuştim bi derba xencerê,
Kuştim bi derba xenceran.

Gezme û xedenga awuran,
Remz û îşaret û soran,
Dan dil ji nîva pencerê,
Dan dil ji ber husna bi nûr,
Berqa tecellîyê sedûr,
Lew sohtime wek guhê tûr,
Hub û evîna enverî.

.....

Latu husnî û şahê xubanî,
Bi xwe hem xanî û hem xaqanî,
Yûsûfê sanî tu îro xanim,
Ku bi husna xwe nedîrî şanî,
Bi sur û heybet û sehmê xwe perî,
Bi te şîr li Bohtan sultanî,
Bi teblxaney şahî, were text,
Ku tu îro şahî Kurdistanî,
Kagulê berde bi ser xal û xetan,
Ku musilsil bi nimûnê reyhanî

.....

Tu mebê bê ser û bê samanim,
Gulê baxê îremê Bohtanim,
Şebçiraxê şebê Kurdistanî,
Çi tebîyet beşer û însanim,
Lîla-el hemd çî alî şanim,
Di rîya yar li rêza saanim,
Lew di îqlîmê suxen xaqanim,
Sibahê eyd ê ez pêzanîm.

Prof. Qanatê KURDO
Tarîxa Edebyeta Kurdî (I)
Weşanên Roja Nû, Stockholm 1983

İÇE KAPANMAK DEĞİL, DIŞA AÇILMAK...

Doğan ÖZGÜDEN

Göçmen olmak... Sürgün olmak... Yıllar var-ki, yerinden, yurdundan, yakınlarından kopma acısını da birlikte getiren, kişiyi hiç tanımadığı, diline, töresine yabancı olduğu diyarlarda ömrünün tamamını veya büyük kısmını geçirmeğe zorlayan bu ikili olgu, Türkiye insanının önemli bir kesiminin ortak yazgısı.

Kimisi kendi yurdunda insanca yaşamın asgari koşullarından dahi yoksun bırakıldığı için herşeyini terkederek emek gücünü Avrupa sermayesine satmak üzere gurbetin acılı yollarına düştü; kimisi ise, Türkiye'deki sınıfsal, ulusal ve dinsel baskılar dayanılmaz boyutlara ulaştığı için ve de bu baskılara karşı mücadele olanakları tamamen elinden alındığı için sürgünün acılı yolunu tuttu, "ilticacı" oldu.

Aslında göç ve sürgün Anadolu insanı için yeni bir olgu da değil. Tarih boyu Kürd'üyle, Ermeni'siyle, Süryani'siyle, Kıldani'siyle milyonlar ve milyonlar bu acıyı yasadı, bugün de yaşamağa devam ediyor.

Osmanlı'nın kanla ve zulumla beslenen yayılcılığı, sömürgeciliği ve sömürücülüğü, kendine karşı duran kim olursa olsun, din, dil, ırk farkı gözetmeksizin hepsini kılıçtan geçirdi, kılıçtan kurtulanlara gurbetten, sürgünden başka çıkar yol bırakmadı.

Bu acıyı ilk tadanlar kuşkusuz 1071 öncesinin yerleşik Anadolu halklarıydı. Altı yüzyıllık Osmanlı tarihinde, onların kalıntılarıyla birlikte, Türk ya da sonradan Türk'leştirilmiş, müslümanlaştırılmış köylü, esnaf, zanaatkar da Osmanlı zulmünden nasibini aldı.

Tüm insanların, din, dil, ırk farkı gözetmeksizin, insanca yaşama düzeyinde kardeşliği ve dayanışması uğruna bayrak açan Şeyh Bedreddin hareketi'nin müslüman, hristiyan, musevi takipçileri olsun, isyanını Pir Sultan'ın değişlerinde dile getiren aleviler olsun, sipahi zulmüne direnen sünni köylüler olsun, kitleler halinde kırıldı, yerinden yurdundan edildi.

Kemalist dönemde göç ve sürgün

Modern tarihin ilk büyük insan kırımı son yüzyıl dönümünde yine Anadolu topraklarında uygulandı. Sosyal bakımdan aynı yazgıyı paylaşan halklar, emperyalist göçlerin de tahriki ve suç ortaklığıyla Osmanlı tarafından ya birbirine kırdırıldı ya da doğrudan ordunun süngüsüne, kurşununa hedef kılındı. Türk işçisi, köylüsü, esnafı ise, pan-türkist savaş gılgnlıklarında Alman militarizminin yayılcı emellerine peşkeş çekildi.

Cumhuriyet döneminde özde değişen pek bir şey yok. Jön Türk paşalarının ırkçılığı, işçi köylü düşmanlığı, emeği sermayeye ne bahasına olursa olsun alabildiğine sömürtme siyaseti, Türk burjuvazisinin Kemalist iktidarları tarafından, fes yerine şapka giydirilmiş olarak, daha da kurumlaştırılarak sürdürüle geldi. Dünyanın dört bir bucağına dağılan Ermeni diasporası jenosid'in yaralarını sarmağa çabalarken, Anadolu'da Kürt halkı Türk şovenizmine yüzbinlerce evladını kurban verdi; ana dilini kullanmak, öz kültürünü yaşatmak ve geliştirmek hakkından dahi yoksun edildi.

Türkiye işçi sınıfı, esnaf ve zanaatkar kitlesi, köylüsü, Türk, Kürt, Süryani, Ermeni, Kıldani farkı gözetilmeksizin sermaye sömürüsünün pençesinde günden güne daha yoksul, daha güvencesiz bir yaşama mahkum edildi. Zaman zaman elde edilir gibi olan sosyal, siyasal, kültürel haklar birbirini izleyen askeri darbelerle hunharca yok edildi.

Bu da yetmezmiş gibi, Kuzey Kıbrıs'ın işgalinden sonra, şimdilerde Musul ve Kerkük petrollerini güvence altına alma bahanesi altında Güney Kürdistan'ı da sömürgeleştirme hesapları gündeme getirildi.

**BLACK
BOOK**

TURKEY

KEMALİZM ÜZERİNE TEZLER : 2

HAMİT BOZARSLAN

12 Eylül 1980 Darbesi'nin getirdiği rejim hangi renge ve hangi kılığa bürünürse bürünsün, başında kim olursa olsun fasizan karakterlidir, uluslararası planda ABD emperyalizminin hizmetinde yayılmacı-sömürgeci, iç planda sınıfsal, ulusal ve sosyal hakları hiçe sayan baskıcı-sömürücü siyasetleri uygulamak durumundadır.

Türkiye nüfusunun çeşitli bileşenlerinin Türk'lerin, Kürt'lerin, Ermeni'lerin, Süryani'lerin, Kıldani'lerin Türkiye'de politik ve hatta demokratik örgütlenebilmelerinin koşulları yasal planda bugün için mevcut değildir. Dış baskılar altında Türk soluna örgütsel planda ne denli serbestlik tanınırsa tanınsın, varlığı dahi inkar edilen diğer halklara kendi ulusal özellikleri temelinde örgütlenme hakkı tanınması bu rejimde beklenemez. Kemalizm'in başta gelen "tabu"larından Ulusal Sorun, "yasal sol"un gündemine uzun yıllar giremeyecektir. "Ulusların kendi yazgılarını kendi belirleme" hakkını savunmak şöyle dursun, dillerine ve kültürlerine saygı gibi en doğal ve "masum" istemler bile 1982 Anayasası'nın ve onun faşizan kurumlarının sansürüne çarpacaktır.

Şu halde, Türkiye nüfusunu oluşturan tüm halkların ve toplulukların ulusal haklarının savunulması ve yüceltilmesi, daha uzun yıllar Türkiye ve Türkiye Kürdistan'ında "yeraltı" mücadelesi yürütmekte olan devrimci örgütlerin etkinlik kazanmasına bağlıdır.

Türkiye dışındaki mücadele

Bu mücadelenin başarılı kılınmasında bir diğer önemli etken de, Türkiye dışında olu-

KEMALİZM ÜZERİNE TEZLER : 1

HAMİT BOZARSLAN

şan milyonluk göçmen ve sürgün kitleleri içinde, bir yanıyla Türkiye'ye, diğer yanıyla da uluslararası kamuoyuna yönelik olarak yürütülen çalışmalardır.

Bugün Türkiyeli göçmen ve sürgünlerin bulunduğu tüm ülkelerde bu planda önemli adımlar atılmıştır. Türk, Kürt, Ermeni, Süryani, Kıldani grupları Avrupa sosyal yaşamının önemli baskı grupları olma sürecindedir. Bu süreç içerisinde her gün yeni demokratik örgütlenmeler doğmaktadır.

Ancak sadece kendi içine kapalı olarak, diğer milliyetlerle ve sosyal güçlerle diyalogtan yoksun biçimde örgütlenme sonuç alıcı olamaz. Bu örgütlerin, göçmen ve sürgün gerçeğinin özelliklerini ve yerel demokratik güçlerle kaynaşmanın önemini göz önünde tutarak, bulundukları ülkelerin siyasal, demokratik ve sendikal örgütleri içerisinde elle tutulur biçimde varolmaları ve etkinlik göstermeleri gerekir.

Örneğin, bugün Avrupa'da yakıcı sorun haline gelen "yabancılarla siyasal haklar sağlanması" yolundaki mücadelede Türk, Kürt, Ermeni, Süryani, Kıldani örgütleri aktif olarak yeralmalıdır. Yerli "charité" kurumlarının himayesinde herşeyi onlardan bekleme pasifliğinden kurtulup, bugün Türkiye'de kullanılmayan siyasal ve demokratik hakları Avrupa gerçeği içinde sonuna kadar kullanma mücadelesi verilmelidir.

Belçika'da Türkiyeli göçmenlerin ve sürgünlerin tümü, Kürd'üyle, Ermeni'siyle, Süryani'siyle, Kıldani'siyle, ulusal kökenlerine ve özelliklerine bakılmaksızın bir kalemde "Türk göçmeni" kategorisine sokuluyorsa, sendikalar aiddat ödeyen Türkiyeli üyeleri içinde Kürt'lerin, Ermeni'lerin, Süryani'lerin, Kıldani'lerin de bulunduğunu

bile bile onlara yönelik olan servislerini "Türkiyeli" yerine "Türk" kelimesiyle adlandırıyor, diğer göçmen topluluklarının ilerici örgütleri bile örneğin bir Kürt örgütünün ayrı ulusal niteliğini görmezlikten gelerek onu "Türk örgütleri" kategorisine sokmağa çalışıyorsa, bu planda yapılacak daha çok çalışma var demektir.

Üç ulusal gruptan oluşan, Fransızca, Flamanca ve Almanca'yı resmi dil olarak kabul eden ve her ulusal topluluğa kendi özerk yönetimlerini kurma hakkı tanıyan Belçika gibi bir ülkede aynı hakların göçmen topluluklarının kendi içindeki ulusal gruplardan esirgemesi kabullenilir bir durum değildir.

Avrupa Ekonomik Topluluğu'nun başkentinde bu diskriminasyonun ortadan kaldırılması, diğer Avrupa ülkelerindeki benzer uygulamalara son verdirilmesi açısından da büyük önem taşımaktadır.

Bu Mucadelenin başarısı, tekrarlayalım, ön-

celikle her ulusal topluluğun kendi iç örgütlenmelerini geliştirmesine ve aynı zamanda diğer göçmen örgütleriyle ve Belçika'nın yerel politik, demokratik ve sendikal örgütlerine kendi kişiliklerini kabul ettirmelerine bağlıdır.

Bu ise, tüm demokratik Türk, Kürt, Ermeni, Süryani, Kildani örgütlerinin karşılıklı saygı ve eşitlik temeli üzerinde dayanışmalarının, siyasal haklar uğrunda diğer göçmen örgütleriyle ve demokratik örgütlerle birlikte ortak mücadeleye girerek etkinliklerini artırmalarını güncel kılmaktadır.

İçe kapanmak değil, dışa açılmak...

Bu, hem göçmen ve sürgün olarak bulunduğu ülkelerde insan onuruna yakışır biçimde yaşamamız, hem de Türkiye'deki şovenist ve faşist uygulamalara karşı uluslararası planda daha etkin mücadele yürütebilmemiz, daha da önemlisi Türkiye'de zor koşullarda mücadele veren kardeşlerimize gerçekten yardımcı olabilmemiz için vazgeçilmez, olmaz koşuldur.



1986
OCTOBRE

INFO-TÜRK

bulletin mensuel • monthly bulletin • maandelijkse bulletin

120


10ème année • 38, rue des Eburons - 1040 Bruxelles
Edité en français et en anglais par le Collectif Info-Türk •
Tél: (32-2) 2303472 • ISSN 0770-9664 • Dépôt légal: 2198
Abonnement annuel: 500 FB • CCP 000-1168701-45 • Bxl.

SCENARIO

DE L'OCCUPATION EVENTUELLE DES CHAMPS PETROLIFERES IRAKIENS PAR
L'ARMEE TURQUE EN CAS DU RENVERSEMENT DU REGIME DE BAGDAD PAR L'IRAN

Juste après les élections partielles qui ont considérablement bouleversé le cadre politique imposé par les militaires, la population de Turquie s'est vue, dans le cours du mois d'octobre, conditionnée par les grands médias à croire à l'engagement inévitable du pays dans la guerre du Golfe.

L'impuissance de l'armée turque devant la guérilla kurde qui se développe depuis août 1984 et la pénétration des forces iraniennes dans les champs pétrolifères de l'Irak ont fait l'objet de plusieurs spéculations relatives aux projets éventuels du gouvernement turc. Parmi ces spéculations, ce qui a fait le plus grand écho aussi bien dans la presse turque que dans les médias mondiaux, a été une invasion éventuelle de l'I-



D Î R O K A K U R D Î S T A N Ê D Î

- VII -

B. D e m a i s l a m î h e t a 1 9 2 0

J I 1 6 5 0 H E T A 1 7 3 0

"Kurdistana Mezin", weka ku Şeref El-Dîn ew wesf kiri bû, û weka rêzeke mîriyên kurdî yê OTONOM, ji sedema avakirina sazendeyeke (idare) tirkî di SANCAKEN ku nêzîktirînên Diyarbekir û Wanê bûn de, îcar piçûk bû bû. Ne bitenê peymana 1049/1639 ji dirêjbûna farisî ber bi Rojavayê re dawî danî, lê Tirkîye, di dema destelata (hikm) neweyê (nesl) duyemîn ê Safawîyan de, di vegirtina (işgal) wilayetên rojavayî yê Farisistanê û yê Piştî Qefqasyê de serfiraz bû (Hammer, GORZ, IV, 235). Hema hemî Kurdan xwe bi vî awayî di bin destelata osmanî de dît. Ji bo ku nema ji Farisan ditirsiyan, Tirkan bi awakî rêkûpêk (muntazam) hêza xwe da navendkirinê (bi fransîzî: Centralisation).


Di bin Murad IV de jî, Melek Ahmed Paşa, ku di 1639 de waliyê giştî yê Diyarbekrê hati bû teyîn kirin, dijî Yezîdiyên Sincarê şerr kir. Paşê (1065/1655) vî paşayî bixwe ku hat şandin Wanê Kurdên vê navçeyê bindest kirin.

Di 1666 de, Kurdek, lawê şêxekî, xwe

weka MIHDÎ îlan kir, lê ji aliyê waliyên Mûsil û Amadyê hat girtin. Giringiya vê pirsê piçûk bû ji bo ku Muhammed IV xwedê giravî (bi tirkî: Göye) Mihdî kir şagirtê xwe yê xweyî (şexsî) (Hammer, 111, 589).

Di bin Şah Huseynê qels de, Kurdên Iraqa Farisî Hamadanê di 1719 de vegirt û têkdanên (xerakirin) xwe gihandin paytextê bixwe. Di 1722 de, bi fermana (emr) Şah Tahmasap II, serokê kurd Fandun (Ferîdûn?) tecrube kir ku Isfahanê, ku ji aliyê Afganani hati bû vegirtin, ji nuh de bistîne, lê ev êrîş bitenê li ser taxa ermenî çêbû. Afganani Fandun, ku vegeriya zewiyên (erd) xwe û xwe xist bin destê Tirkan, vegerand (Hanway, A historical account of the British Trade, 1753, cild III).

Bexta Safawîyan tu ne bû. Heta Abbas Kulî Xan Ardalan jî xwe xist bin destê Hasan Paşa (Hammer, IV, 211; lê li RMM, XLIX, 87 binêre). Serokên Cawanrûd, Darna, Caf, Harsîn û di dawiyê de SIPAHSALAR Alî Mardan Feylî, ku xwe kişandi bû Lûristanê, jî weka wî kir (Hammer, IV, 227).





(*) Encyclopédie de l'Islam, 1981. Wergerandin, fransîzî-kurdî: Pervîn.

A N S Î K L O P Ê D Î Y A İ S L A M Ê D E (*)

A F G A N

Di dema destelata xwînî û kurt a maliya qralî ya afganî li Isfahanê, Eşref Tirkan, ku di bin fermana wan de 20.000 Kurd di bin serokatiya Belek Suleymanoglu (Suleyman Baban?) de hebûn, şikandin (şerrê Ancîdan, di 1726 de). Tirkan sedema şikestina xwe di tevgera Kurdan, ku Eşref ji wan re gelek soz dabûn, de didît. Bi rastî, berê hinek

Kurd bû bûn hevalbendên Afganên. Li gel serfiraziya yekemîn, hema piştî salekê (1140/1727) Eşref diviya mafên xwe yê destelatê bi hiştina hemî Farisistana rojavayî ji Tirkan re, tevî hemî nahiyên kurdî û lûrî, bikire. Leşkerên afganî demekê li Kurdistanê perîşan geriyan.



N A D I R Ş A H

Di nêzîkî dawiya hikmê Ahmed III de, guhertinek di nav rewşan de hat hest (his) kirin. Bi peyman 1144/1732, Farisan wilayetên xwe yê rojavayî ji nuh de stendin, û zû Nadir zewiyê osmanî heta deriyên Begdadê vegirt. Tirkan bê hûde (bê feyde) tecrube kir ku bi leşkerên kurdî dijî wî derkevin, lê hema ji 1733, Topal Osman Paşa ku li Mûsilê alîkariyên kurdî stendi bûn derket meydanê. Nadir hat şikestin. Di 1734 de, wî bi serfirazî li Qefqasyê şerr kir û Tiflîsê, ku ji aliyê leşkerekî 6.000 Kurd hati bû vegirtin, stend. Bi aşîtiya 1149/1736, sînorên kevn ên 1049/1639 hatin danîn. Di 1743 de, Nadir ji nuh de Tirkîyê vegirt, lê li gel alîkariya Kurd û Ereban, ew heta Sinne hat vegerandin û şikestina dawîn xwar (berhema buhurî, IV, 317, 398-

399).

Nadir di nav Kurdan de ne gelerî bû, li gel hebûna helbesteke destanî bi zaravê gûranî li ser şerrên wî bi Topal Osman Paşa re. Li ba Ardalanan, Nadir cihê Subhan Werdî Xan da birayê wî, û vê yekê serhildaneke gelerî derxist (RMM, XLIX, 88). Di 1727 de, di dema serhildaneke Tirkmenan de, Kurdên Xurasanê (Çamişgezêh û Karaçorlu) ne xwest ku alî Nadir bikin û wî seza da wan (ew ceza kirin) û ew şandin Maşadê. Nadir di 1747 de, di dema ku ewê careke din jî ceza bida serhilên kurd ên Xurasanê, hat kuştin (Jones, Histoire de Nadir, London 1770, 118-20). Kurd (Dumbulî û hwd.) beşdar bûn tevliheviya (anarşî) ku piştî mirina Nadir çêbû, lê Derî bicarek têkiliya wê ne bû.

MALBATA QRALÎ YA ZEND


Piştî hundabûna Nadir Şah, Kerîm Xan Zend, yek ji çêtirînên fermandarên ku Farisistan di dîroka xwe de dîtiye, perça mezintirîn a vî welatî hikm kir. Zend êleke kurdî ya ne pirr giring (Şerefname, I, 323) ku di navbera Hamadan û Malayirê de, li nahiya ku ji berê navê wê Îxar bû, rûniştî bû bû. Di bin Nadir de, Zend ber bi Xurasanê hati bûn birin, lê piştî mirina wî ew

vegeriyan hêlînên xwe (Tarîxî Zandiyya, weşana Beer, rûpel XI, XVIII). Bi mirina Lutf Ali Xan di 1209/1794 de, ev malbat ne ma. Êla Zend bê gûman pirr qels bû ji bo ku alîkariyeke giran bide malbatê, lê Kerîm Xan, weka pêşiyên xwe, çend êlên kurdî ji Kurdistanê anîn Şîrazê (Ahmadawan, RMM, XXXVIII; KORONÎ ku li taxeke taybetî li Şîrazê rûdinên, O. Mann, Die Tajik Mundarten d. Provinz Fars, Berlin 1909, XXIX).

K A C A R


Bi mirina Axa Muhammed Şah Kacar (1211/1797), Sadik Xan Şakakî elmasên tacê stendin û di demeke kurt de tecrube kir ku wiraseta qralî bistîne (The dynasty of the Kajars, wergerandina Harford Jones Brydges, London 1833, 20, 27-32, 37, 50, 78, 106; R. G. Watson, A history of Persia, London 1866, 107, 115, 125). Ji 1221/1805, Farisan aliyê Abdulrahman Paşa yê Suleymaniyê girt (li Rich, Narrative, I, 384; Watson, berhema buhurî, 155, û strana kurdî ya Mukrî di dîwana O. Mann, N° XVI de binêre). Di 1236/1821 de, piştî tevliheviyên ku ji sedema êlên kurdî yên Haydaranlu û Sipkan çêbûn, Farisan zewiyê tirkî heta Bidlîs û Mûşê vegirt; di vî zemanî bixwe de jî, bi riya Kermanşahê, ew ketin heta Şerabanê, nêzikî Begdadê. Aştiya 1238/1823 ku li Erzurûmê hat imza kirin

sînoren 1049/1639 vegerandin, lê Farisan ne xwest ku ji qezayê Zohabê ku tije Kurd bû derkevin. Pirsên Suleymaniyê ewha man. Şerrekî nuh dikira di 1842 de biteqiya dema ku Ingiltere û Rûsya ew li hev kirin û, di 1264/1847 de, peymanê nuh li Erzurûmê hat imza kirin. Li gora vî peymanê, Zohab diviya di du beşan de bê par kirin û Farisistan ji Tirkîyê re hemî Suleymaniyê berda. Di salên 1848-52 de, Komisyoneke tevlihev ku ji nûnerên çar hêzan pêk bû bû li sînorê gerriya, lê tevgera şaneyê (delege) osmanî Derwîş Paşa ne hişt ku ev xebat biçe serî. Derwîş Paşa ne bitenê nahiya Kotûr bi awakî leşkerî da vegirtin, lê di bîranîneke dizî de (li Istanbulê, di 1286 û 1321 de, hat weşandin), wî dozînekê (têz) li ser mafê malxweyiya Tirkîyê li ser tevayiya nahiyên kurdî li Başûrê û Rojavaya gola Urmiyê darîçav kir.



Ji 1826, ji waliyê Sîwasê, Reşîd Mehmed Paşa, re erkê rawestandina Kurdan û bicihkirina waliyên tirk li Kurdistanê hati bû dayîn. Di nêzîkî 1830 de, tevgerê fireh a kurdî di çend cihan de xuya bû. Pêşengên wan Bedir Xan û Saîd Beg, İsmail Beg û Muhammed Paşa yê Rawendûzê bûn. Di nêzîkî 1820 (1830?) de, evê dawîn serxwebûna xwe îlan kiri bû û êrîşî êlên Xoşnaw kiri bû; di 1831 de, wî Erbîl, Altun-Köprü, Köy-Sancak û Raniya stendin. Sala paşê, destelata xwe gihand Mûsilê; li Alkoşê 172 fille hatin kuştin. Paşê Akra, Zîbar û Amadya hatin vegirtin. Di 1833 de, leşkerên Rawandûzê keti bûn heta Zaxo û Cezîrê ji bo ku Bedir Xan ji nuh de deynin wan deran. Çend caran, yezîdî bi hişkî hatin sezadan: Serokê wan, Alî, ku ne xwest bibe misilman, hat kuştin (li strana gelerî ku vê bûyerê tîne bîran, di JA, 1910, 134-6 de, binêre) û gelha Yezîdîyan li ser gira Koncîkê hat ser jê kirin. Di 1835 de, leşkerên osmanî dijî Mehmed Paşa ji Begdad, Mûsil û Sîwasê hatin şandin û, di 1836 de, Mîrê Rawendûzê bi zexelfî (hîle) hat dîl (esîr) kirin. Serhildanan û pelixandinên wan cardin çend salan ajot (li Poujoulat, Voyages, I, 373, Moltke, Briefe, Berlin 1841, 259-84 binêre).

Şikestina Nizîb (1839) ku Misriyan anî serê Osmaniyan tevliheviyên nuh li Kurdistanê çêkirin. Di 1843 de, serhildana Nurallah Beg ê Hekkarî û Bedir Xan ê Cezîrê dest pê kir. Filleyên Nestûrî yê Hekkarî li Mûsilê dijî pelixandinên Nûrallah Beg gilî kiri bû. Weka bersiv, evê dawîn nahiya nestûrî ya Berwarî talan kir. Serjêkirinan çend salan ajot, û tê gotin ku jimara qurbanan gihajt 10.000. Hêzan li İstanbûlê xwepêşandinên leşkerî çêkirin û, di 1847 de, leşkerê giring di bin serokatiya Osman Paşa êrîşî Kurdan kir. Bedir Xan û Nurallah ku çend caran hatin şikestin xwe da dest (teslîm bûn) û ji Kurdistanê hatin qewirandin (Layard, Nineveh, fesi VII; Revue de l'Orient Chrétien, V "1900", 649-53; Eddé Scher, di JA, 1910 de; li ser pêwendiyên kurdî-nestûrî, ji nav ên din li vana binêre: Grant, The Nestorians, New York 1841; Badger, The Nestorians, London 1852; J. Perkins, A residence of 8 years in Persia among the Nestorian Christians, New York 1852; C. Sandercki, Reise nach Mosul, Stuttgart 1857; Riley, Christians and Kurds, di Contemporary Review, îlon 1889 de; F. N. Heazell û J. Margolouth, Kurds and Christians, London 1913; Wigram, The cradle of mankind, London 1914; W. W. Rockwell, The pitiful plight of the Assyrians, New York 1916; H. C. Luke, Mosul and its minorities, London 1925).



Şerrên rûsî-tirkî

Ji 1804-5, Rûs bi Kurdan re ketin pêwendîyan û ev kartêkirina (tesîr) nuh zû hat hest kirin. Şerrên rûsî-tirkî yê 1828-9, 1853-8, 1877-8 her car kartêkirinên giring li ser Kurdistanê kirin (ev pîrs bi awakî taybetî ji aliyê Averianov, Kurdî v voinax Rossii, Tiflis 1900, Jêhûrnêrîn). Hîn di 1829 de, Rûsan leşkerê kurdî amade kiri bû. Piştî derketina Fillan, Kurd piştî şerr ber bi Bakur û Rojavayê gelek dirêj bûn. Di dema şerrê Ukranyê de, Rûsan du leşkerên kurdî pêk anîn. Ji derveyî vana, dema ku leşkerên tirk çûn Bakur, tevgerê giring li Botanê ji aliyê Yezdan Şêrê pîr gelerî, birazî û nahezê kevn ê Bedir Xan, hat ajotin.

Di dû şerrê 1877 de, di destpêkê de, serhildanek di nav Kurdên Hekkarî, Behdînan û Botan de, di bin serokatiya lawên Bedir Xan de, û paşê tevgera Şêx Ubeydullah, ji tarîqa Neqîşbendî, ku bî fikir (difikirî) ku Kurdistanê otonom di bin destelata osmanî de ava bike, çêbûn. Kurdên êrîşker di 1880 de navçeyên farisî yê Urmiyê, Sawc-Bûlak, Miyandoab û Maraşa talan kirin û heta Tebrîzê jî haraşa (tehdîd) kir. Qurbanên sereke ji Şîyan bûn. Rûsya leşke-

rekî civand ji bo paraztina sînora Arasê. Farisistan hêzên giring, weka siwarên Makû, amade kir. Tirkîye, ku hîn nuh ji şerr derketi bû, tecrube dikir ku ji pirsên tevlihev dûr bikeve. Li dawiyê, Şêx vege-riya Şemdînanê û ji wê derê hat şandin Istanbûlê. Ew zû ji paytextê reviya û, bi riya Qefqasyê, vegeriya Şemdînanê, lê ew ji nuh de hat dîl kirin û, di 1883 de, rojên xwe li Mekkê qedandin.

Leşkerên Hamîdiyê

Qelsbûna osmanî piştî 1878. Bend 61 a peymana Berlînê ku ji Ermenîyan re "islahat" û emniyetê "dijî Kurd û Çerkez" dabîn (temîn) kirin, dijrabûna xurt a hikûmeta osmanî li hemberî van islahatan, û ji 1885 pêşveçûna tevgera şoresgerî ya ermenî û girêdanên wê bi Rûsya, Swîsra û London re, jîna Kurdan û Ermenîyan, ku heta nuha rehet bû, tev li hev kir. Evên dawîn di bin destelata serokên derebe (fêodal) yê kurd de bûn. Di nêzîkî 1891 de Şakir Paşa, ku paşê diviya dest bi islahatan li Anadolû bike, bîr kir ku leşkerine kurd ên ne rêkûpêk (muntazam), ên weka kozakên rûsî, ava bike. Amanca vê islahatê gihandina Kurdan û girêdana wan bi Dewleta Osmanî bû. Ev tecrube ne têrker dihat dîtin lê avakirina HAMÎDIYYÊ, bi rola ku ji Kurdan re hat dayîn û bi hestên mezinahiyê ku hatin şiyar kirin, tevliheviyeke mezin derxist. Şerrên xwînî di navbera êlan de derketin.

Pêwendiyên Ermenî-Kurdî

Di vî zemanî bixwe de, pêwendiyên Ermenî

û Kurdan (ev "birayên erd û av" li gora hevoka ku ji aliyê konsolosên ewrupî hati bû berhev kirin) ne baştir bûn. Havîna 1894 bi şerrên xwînî li Sasûnê, ku bi talankirina pênc gundan û hemî nahîya Talorî (Dalvorix) ku di wan de Ermenî rûniştî bûn, hat nîşan kirin. Bûyerên Sasûnê rêzeke xwepêşandinên ermenî û ya pelixandinên wan ên xwînî ku Kurd bi awakî xurt beşdarî wan bûn vekirin. Di wê demê de, di 1895 de, tecrubeke serhildanê ku zû hat pelixandin di nav Kurdên Hekkarî de çêbû: Ew ne dijî Fillan bû. Ji destpêka sedsala XIXmîn heta şerrê cihanê, pêwendiyên ermenî-kurdî rehet xuya dibûn. Bi awakî giştî, li ser pêwendiyên kurdî-ermenî binêre: Abovian, Kurdî, di rojnava Kavkaz, Tiflîs 1848, N° 46, 47, 49, 50 û 51 de (tê de "bavê bêjeya ermenî" wêneke gelek baş a rewîştê "exlaq" kurdî dikişîne); Creagh, Armeniens, Koords and Turks, London 1880; A.S. Zelenoy, Zapiska karte raspredeleniya armiansk. nasele-niya, di Zapis. Kavkaz de. Otd. Geor. Obshç., Tiflîs, XVIII (1895). A Vambéry, Armenier u. Kurden, di Deutsche Rundschau, LXXXVI (1890), 216-31 de; Rohrabach, Armenier u. Kurden, Verhand. d. Gesch. f. Erdkunde, Berlîn 1900, 128-33; L. de Contenson, Chrétien et Musulmans, Paris 1901; H. B. Lynch, Armenia, passim; Mayevski, Opisanie Vanskago i Bitlis vilayetov, Tiflîs 1904 (berhemeke sereke); N. Marr, Yeşçe o slove "çelebî" di Zap., XX (1910) de; La question kurdo-arménienne di La Revue de Paris, hejmara 15 Nîsan 1914 de; nameyên diplomatîk ên ku di "Livres jaunes" "Blue books" û "Livre orange" ên rûsî de, di 1914 de, hatine weşandin.



MAMO 37.

Allegro

Ma - mir. Ma - mir. Ma - mir. lo. Ma - mo.
Ma - mir. Ma - mir. Ma - mir. pis - ma - mo.

Mamir, Mamir, Mamir, lo, Mamo, Mamir, Mamir, Mamir, pis-mamo.	Ava ji gûdêkê, lo, Mamo, Ava ji gûdêkê, pis-mamo.
Ava ji ç'lyê tê, lo, Mamo, Ava ji ç'lyê tê, kutmalo,	Hêlûna ser ç'ûkê, lo, Mamo, Hêlûna ser ç'ûkê, kutmalo.
Nev gulê nêrgîsa tê, lo, Mamo, Nev gulê nêrgîsa tê, pis-mamo,	Jê tê bîna bûkê, lo, Mamo, Jê tê bîna bûkê, pis-mamo.
Bîna yara jê tê, lo, Mamo, Bîna yara jê tê, kutmalo.	Xelqê yara te bir, lo, Mamo, Xelqê yara te bir, pis-mamo.


Xelqê xalînga te bir, lo, Mamo,
Xelqê xalînga te bir, kutmalo.

Di destpêka sedsala XXmîn de, ruyekî nuh li ufuka kurdî, li derveyî navendên herdemî yê tevgerê, xuya bû: Yê Ibrahîm Paşa Ibn Mahmûd Ibn Tîmawî Ibn Eyyûb, serokê êla Millî (Milan) di nahiya Şarîwêran de (di navbera Diyarbekir û Helebê de). Ibrahîm Paşa ji xwe re rewşeke hema serbixwe ava kiri bû. Dema ku Destûra 1908 hat îlan kirin, ew bi awakî vekirî rabû ser xwe û xwe kişand çiyayên Ebd El-Ezîz û li wê derê hat kuştin (M. Wiedemann, Ibrahim Pascha's Glück und Ende, di Asien, VIII (1909), 34-7, 52-4 de; M. Sykes, The Caliph's last heritage, 317-27).

Heyecaneke mezin di nav Kurdan de ji sedema nûjenkirina pirsê sînora tirkî-farisî çêbû. Piştî şkestina rûsî li Rojhilata Dûr, Tîrkiye (ji 1905) nahiyên ku li ser wan lihevhatin ne bû, yê Urmiye û Sawc-Bûlak, ku tê de Kurd rûniştin bûn vegirtin. Evên dawîn di lîzên cihê yê destdanînê rêzanî (siyasî) de hatin kişandin. Vegirtina tirkî bitenê di destpêka şerrê balkanî de (di Cotmeha 1912 de) rawestiya, lê bitenê ji bo ku cihê xwe ji leşkerên rûsî, ku hati bûn şandin navçeya Xoy û Urmiyê, re bihêlin. Zarokine malbatî ne kurd ên resen (esîl) li Rûsyê gerriyan. Di 17 Mijdar 1913 de, protokoleke destnîşandane li Istanbulê hat imza kirin û, hema berê şerrê cihanê, komisyoneke çar-alîyî (Tîrkiye, Farisistan, Ingiltere, Rûsya) di destnîşandana sînora navçeyên nelihevhatî de, bi veqerandina hema hemî rewşa destpêka sedsala XIXmîn, serfiraz bû (li Minorsky, Turetsko-persidsk. razgraniçeniye, di Izvestia Russ. Geogr. Obsç, LII "1916", 351-92 binêre).

Şerrê 1914-18

Di dema şerrê 1914-18 de, Kurd ji nuh de ji aliyê hêzên dijî hevdu hatin kişandin. Li ser tevgerên Ismaîl Axa Sîmko, li ŞAKAK binêre. Li ser planên di nav hevalbendan de (Adar 1916) ên li ser Kurdistanê, li belgeyan di Razdel Aziatskoi Turtsii, Mosko 1924, 185-7, 225 de binêre. Piştî 1917-18, rewş bi awakî bingeşî guherî. Komîtên kurdî li her derî pêk bûn (li Driver, Report on Kurdistan, Mount Carmel 1919 binêre. Ev weşan li British Museum e). Li Parîsê, Şerîf Paşa rola nûnerê kurdî stend û, di 22 Adar 1920 de, wî ji konfêransa Aştiyê re du bîranîn li ser daxwaziya kurdî, tevî nexşeye "Kurdistanagiştî" pêşkeş kir (li Asie Française, 1919, N° 175, 192-3 binêre). Di vê demê bixwe de, di 20 Kanûn 1919 de, lihevhatinek di navbera Şerîf û nûnerên ermenî de hat danîn û, bi hev re, her du alî daxuyaniyan li Konfêransê çêkirin (li metnê lihevhatinê di



rojname Peamî Sabah, Istanbul, 24 Sebata 1920 de binêre; û li Le Temps, Parîs, 10 Adar 1920 jî binêre). Peymana Sêvres a 10 Tebax 1920, ku Ermenistanê ava kir (bend 88-93), di çarçeva çar wilayetên (Trabzun, Erzurûm, Wan û Bidlîs)ê de, di bendên 62-4 de "otonomiyeke navçeyî ji bo navçeyên ku tê de regezê (unsur) kurd li Rojhilata Firatê, li Başûrê sînora Ermenistanê û li Bakurê sînora Tîrkiye, Sûriye û Mozopotamyê heye" destnîşan kir. Eger gelha kurdî, di sînorên ku hatin nîşan dan, ji Konseya Civaka Netewan re isbat bike ku "piraniya gelhê di van navçeyan de dixwazê ku ji Tîrkiyê serbixwe be û eger Konsey dît ku ji destê vê gelhê serxwebûn tê", Tîrkiye dipejirîne (qebûl dike) ku li gora vê tewsiyê biçe, û di vê rewşê de, hêzên hevalbend dijî ragihana jidil (iradî) a Kurdên ku li wilayeta Mûsilê rûdinên bi vê "Dewleta Kurd a serbixwe" dernakevin. Piştî bûyerên paşîn, pirsê kurdî piçûk bû û bitenê li ser çarenûsa (qeder) Kurdên wilayeta Mûsilê ma. Nûnerên tirk dozîna (têz) ku li gora wê "Kurd qet ji Tirkan ne cihê ne. Eger zimanên cihê bipeyivin jî, ev her du gel perçeke tenê, ji aliyê nijad (irq), ol (dîn) û adetan, ava dikin" diparazt (Konfêransa Lausanne, axaftina Ismet Paşa di civîna 23 Çile 1923 de). Bi biryara Konseya Civaka Netewan a 16 Kanûn 1925, wilayeta Mûsilê ji Iraqê re hat dayîn, lê bi bendeke ku ji Kurdan re bicihanîna daxwaziya xwe, bi hêzanî "ku şagirtên (memûr) ji nijadê kurdî ji aliyê sazandeyên (muessese) welatê wan bîn teyîn kirin, ji bo dadî (edalet) û fêrkirinê di dibistanan de, û ku zimanê kurdî bibe zimanê fermî (resmî) yê hemî van sazgehên", temîn kir.

Nivîskar gelek dixwaze ku ji M. G. R. Driver re, ku jimareke mezin a belgeyên dîrokî li ser Kurdan danî ber destê wî, spas bike. Pêşandaneke dîroka kurdî, ku xalên pêşîn ê wê li jor hatin danîn, hîn gelek xebatên amadekar û lêkolînan di dîrokên erebî, farisî, tirkî, suryanî, ermenî û gurcizî de dixwaze. Lêhûrnêrîneke rêkûpêk (muntazam) a çavkaniyên weka Selîm-name ya Hakim Idrîs û ya lawê wî Ebûl Fadl û Tarîqî Alam-Arayî Abbāsî ewê destkewteke (xênîme) dewlemend bide. Bingeza zanînen me li ser dîroka kurdî bê gûman Şerefname ye (heta 1005/1596). Metnê (tekst) wê ji aliyê Veliaminof-Zernof hat weşandin (bi hêzanî li gora destnivîsa ku ji aliyê nivîskar bixwe hatiye berhev kirin): Şerefname, I (dîroka Kurdan), St. Petersburg 1860; II (metnê cihê yê cild I û dîroka giştî ya Tirkîye û Farisistanê ji destpêka malbata qralî ya osmanî heta 1005/1596), St. Petersburg 1862. Jê weşanên nuh derketin: Ji aliyê M. A. Awnî, Qahire 1931, û M. A. Abbāsî, Tehran 1343/1965; wergerandinên erebî ji aliyê M. J. Bendî Rojbayanî, tevî gelek nîşank û vekirinan, Begdad 1372/1953; M. A. Awnî û Yahya El-Xaşşab, Qahire 1958-62, 2 cild; wergerandineke rûsî ji aliyê E. I. Vasîleva, I, Mosko 1967; wergerandina fransizî ya F. Charmay, Cheref-namah yan "Fastes de la nation kurde", du cild û çar beş, St. Petersburg 1868-75, vekirinên fireh tîne (weka wergerandina pişkên "fesl" li ser Cihannama ya Hacî Xelîfe), lê ew gelek kevn bûye û tê de tu nexşeke alfabeyî tu neye. Û li van lêhûrnêrînan jî binêre: H. Barb, Über die Kurden-Chronik von Scheref; Geschichtliche Skizze d. 33 Verschiedenen Kurdischen Fürstengeschlechter; Geschichte V. 5 Kurden-Dynastien; Geschichte d. Kurdischen Fürstenherrschaft in Bidlis, ku bi rêz di Sitzungsber. Aw Wien, X (1853), 3-54, XXX/I (1859), XXXII (1859), 145-250 de derketin. Dîroka Kurdistanê ya Muhammed Efendî Şehrezorî, ku di 1073/1662 de li Medîne mir (li Tac El-Arûs, s.v. Kurd binêre), di 1927 de hîn ne hati bû peyda kirin. Ji bo dîrokên mala Erdelan li SENNA binêre û divê ku em dîroka Xusrew Ibn Muhammed Ibn Minûçîhr (heta 1254/1834) ragihînin wê. Li Blochet, Catalogue des manuscrits persans de la Bibl. Nationale, I, 305, N° 498 binêre. Li ser Risalat ansab El-Ekrad, ku di Muzêya Asyewî ya Lînin-gradê de ye, li Romaskewîç, di Mélanges Asiatiques, rêza nuh, Petrograd 1918, 392 de, binêre. Rojnama Zarî Kurmancî (li Rawendûzê) bi kurdî dîrokeke piçûk "Xunçayî Baharistan" (1926) weşand û weşana nêzîk a Tarîxî Kurdan a Zeyn El-Abidîn Beg îlan kir. Meriv zanînen giştî li ser dîroka kurdî di van berhemên de dibîne: G. Campanile, Storia della regione di Kurdistan

e delle sette di religione ivi esistenti, Napoli 1818; E. Quatremère, Notice sur le Masalik El-Ebşar, NE, XIII, 1838; C. Rich, Narrative (li SULEYMANIYYA binêre); Charmoy, di pêşgotina wergerandina wî ya Şerefname de; Lerch, Izsledovaniya ob iranskix Kurdax, St. Petersburg 1856, I, 20-33; Hoffmann, Auszüge aus syrisch. Akten, 1880; W. Tomaschek, Sasun, di Sitzb. AWW, 133/4 (1895) de; M. Bittner, Der Kurdengau Uchnuje, di Sitzb. AW Wien, 133 (1895) de; H. Rawlinson û A. Wilson di Encyclop. Britannica, 1911, XV, 949-51 de; Eddé Chir, Episodes de l'histoire du Kurdistan, di JA, XV (1910), 119-40 de; Bûyerên 1202, 1508, 1510-2 (Cezîre), 1523, 1689, 1712 (Amadya), 1820-36 (Rawendûz); Soane, To Mesopotamia... in disguise, London 1912, pişk XVI; Minorsky, Kurdî, St. Petersburg 1815; Driver, Studies in Kurdish History, di BSOS de, II/3 (1922), 491-513; V. Minorsky, la domination des Dailamites, di Publ. Sté. Et. Ir. et Arts persans, Parîs 1932 de; nivîskar bixwe, la Perse au XVe s. entre la Turquie et Venise, berhem bixwe, N° 3 (1933); A. Sakisian, Abdel Xan seigneur kurde de Bitlis au XVII s. et ses trésors, di J. A., CCXXIX (1937), 253-70 de; A. Safrastian, Kurds and Kurdistan, London 1948; M. Canard, H'amdanides, I, Cezair 1951; M. A. Zekî, Tarîx El-Duwel welîmarat El-Kurdiyya fî l'ahd el-islamî, wergerandina erebî M. A. Awnî, Qahire 1364-1945; Cl. Cahen, Un traité d'armurerie composé pour Saladin, di BEO, Şam, XII (1947-8), I-163 de; V. Minorsky, Studies in Caucasian History: I. New light on the Shaddadids of Ganja, II. The Shaddadids of Ani, III. Prehistory of Saladin, di Cambridge Orient. Series, N° 6, London 1953 de; nivîskar bixwe, Thomas of Metsop' on the Timurid-Turkman wars, Lahor 1955; nivîskar bixwe, Mongol place-names in Mukri Kurdistan, di BSAS, XIX (1957), 58-81 de; Cl. Cahen, Contribution à l'histoire du Diyar-Bakr au quatorzième siècle, di J.A., 1955, 65-100 de; H. A. R. Gibb, The Armies of Saladin, di Stud. on the Civil. of Islam, Boston 1966 de; nivîskar bixwe, The Achievement of Saladin, berhem bixwe, 91-107; M. S. Lazarev, Kurdistan i Kurds kaya problema, Mosko 1964; A. Xalîf, Bor'ba za Kurdistan, Kurdskiy vopros v mecdunarodnix otnoşeniyax XIX veka, Mosko 1963; Celîlê Celîl, Vosstanie Kurdov 1880 goda, Mosko 1966; N. X. Mahmudov, Le peuple kurde (bi ermenî), Erivan 1959; M. M. Umar El-Abbāsî, Imarat Bahdînan El-Abbasiyya fî Kurdistan El-Wusta, Begdad 1972; S. H. Longgrigg, Four Centuries of Modern Iraq, Oxford 1925.

(V. MINORSKY)

Dûmahî heye

ZIMANÊ KURDÎ

Belavbûna cografî ya zaravên wî (*)

Fuad Hama XORŞÎD

- III -

B E Ş A S I Y E M Î N

N E X Ş A Z A R A V Ê N K U R D Î

Zimanê kurdî û zaravên wî yên navçeyî bi awakî fireh li hemî perçeyên başûrî û başûrî-rojhilatî yên Tirkîyê, yên sînora bakurî ya Sûriyê, perçeya bakurî û bakurî-rojhilatî ya Iraqê û hemî Rojavaya Îranê - ji derveyî navçeya Ermenistanê - dirêj dibin. Û bi vî awayî ew li awhewayekî (iklîm) fireh ê Başûrê Rojavaya Asyê dirêj dibin: Dawiyên wî yên bakurî li Lênîkanê (Ermenistana Sovyêtî) - Kars - Erzurûm - Erzincan - Sîwas - Maraş dirêj dibin. Û ji Başûrê Rojavayî yê Ifrîn - Çiyayê Kurdan - sînorên dewletî yên tirkî-sûrî - çemê Diclê - Rojhilata girên Hemrînê - Mendelî - çiyayên Piştî Kûh - Dezful - heta sînorên Bakurê Rojhilata Kendawê (xelîc) Erebi (Rojhilata Erebiştanê) dirêj dibin.

Lê dirêjbûnên wî li Rojhilatê digihêjin Rojhilata çemê Arasê - Makû - Xoy - kêlekên gola Urmiyê yên rojavayî û başûrî - çiyayê Sahendê (Bakurê Maraga), û ji wê derê digihêjin xêzeke xwarûxêç ku ji van gund û qeseban derbas dibe: Ehmed Abad - Masîr Abad - Bîçar - Esed Abad (Rojavaya Hamadanê) - Karêz - Alî Çadir - Şarî Kurd (Rojavaya Asfahanê). Û li Başûrê digihêje heta Hesar û Bender Dîlem li quncika Bakurê Rojhilata Kendawê Erebi.

Bi vî dirêjbûna fireh, zimanê kurdî ji kartêkirinên (tesîr) zimanî yên zimanên hawsê (cîran) yên hemî aliyan ne dûr e. Ango, zimanê kurdî û zimanên hawsê, weka tirkî li Bakurê Rojavayê, farisî li Rojhilat û Başûrê Rojhilatê û ermenî û tirkmenî li Bakurê Rojhilatê, li navçeyên sînorî bi awakî vekirî dikevin nav hevdu.


Lê li navçeyên navendî, zimanê kurdî û zaravên wî gelek tekûz in, ji sedema durbûna van navçeyan ji kartêkirinên zimanî yên hawsê. Lê li navçeyên sînorî ku tê de ziman dikevin nav hevdu hin gotinên biyanî dikevin nav wan.

Bi tevlihevbûna zimanî em dixwazin bêjin ku sînorine zimanî ku zimanê kurdî ji

zimanên hawsê vediqetînin, weka sînorên rêzanî (siyasî) ku welatan û sistemên wan ên rêzanî ji hevdu vediqetînin, tu nene. Lê navçeyên tevliheviyê merheleke (navçeyekê) derbasbûnê ya tevlihev a her du zimanên hawsê ne. Û dema ku meriv jê derbas dibe bicarek digihêje zimanê din. Weka nîşe: Tевлиhevбûna zimanan li bajarên sînorî.

Eger em werin belavbûna cografî ya zaravên zimanê kurdî, zaravê kurmançiya bakurî li perçeyên bakurî û bakurî-rojavayî yên Kurdistanê dirêj dibe. Kurmançiya navîn li navçeyên navendî û navîn ên Kurdistanê, û kurmançiya başûrî li sînorên başûrî û başûrî-rojhilatî yên Kurdistanê belav dibin. Zaravê gûranî jî bi awakî veqetayî li awhewayên her du zaravên kurmançiya bakurî û navîn belav dibe.

Em dikarin vî berlavbûnê ji nexşê û ji pêşandana jêrîn bi hûrî bibînin:



(*) Çapxana El-Wisam, Begdad, 1983. Wergerandin, erebî-kurdî: Pervîn.

A- ZARAVÊ KURMANCIYA BAKURÎ


Ev zarav ji zaravên din ên kurdî bêtir fireh dibe. Ji bo ku Kurdên Tirkîyê (wilayetên Beyazîd "Karakose" - Wan - Cûlamerî - Siirt - Mûş - Mardîn - Diyarbekir - Xarput - Adiyaman - Gaziantep, beşên rojhilatî yên wilayetên Maraş û Sîwasê û beşên başûrî yên wilayetên Erzurûm û Karsê) pê dipeyivin. Kurdên Yekîtiya Sovyêtî (li Başûrê Rojavaya Ermenistanê) û rûniştevanên wilayeta Dehokê û yên qezayên Zîbar, Amadya û Sincarê li Iraqê jî pê dipeyivin.

Sînora zimanî ya başûrî, ku vî zaravî ji zaravê kurmanciya navîn vediqetîne, xêza xeyalî ku ji kêleka rojavayî ya navîn a gola Urmiyê dirêj dibe, diçe ber bi Başûrê Rojavayê, ber bi Bakurê ji bajarê Şîno û paşê ji şiveriya (riya teng) Kela Şîn (nêzîkî sînorên iraqî-îranî) û çiyayê Helgurdê derbas dibe ye. Paşê ev xêz bi awakî hema perwaz (muwazî) ê Bakurê rûbara Rawendûzê heta rawesta (nuqte) gihajtina wî Zabê Mezin diçe, û paşê li Bakurê Zabê û bi awakî perwaz heta rawesta ketina wî nav

çemê Diclê dewam dike (34).

Ji sedema dirêjbûna fireh a vî zaravî, jê hin zaravên navçeyî ku cihêtiya wan ji hevdu piçûk e derketin. Em dikarin van zaravên şaxî li gora rêzkirina jêrîn bibînin:

1. **Beyazîdî:** Li Bakur û Bakurê Rojhilata gola Wanê.
2. **Hekkarî:** Li Başûr û Başûrê Rojavaya gola Wanê.
3. **Botanî:** Li dora geliya Botan, Siirt - Ardiş - Cezîre - Diyarbekir (Amed).
4. **Şemdînanî:** Li quncika Başûrê Rojhilata Tirkîyê, Rojhilata Zabê bilind û navçeyên hawsê li Îranê.
5. **Behdînanî:** Li wilayeta Dehokê û qezayên Zîbar, Amadya û Sincarê, li Iraqê.
6. **Zaravê rojavayî:** Li Xarput, Urfa, Ifrîn û Maraşê.



B- ZARAVÊ KURMANCIYA NAVÎN

Ev zarav li Başûrê xêza ku me li jor got, ku wî ji kurmanciya bakurî vediqetîne, dirêj dibe: Heta çemê Sêrewan û Xaneqînê li Başûr; ji Rojhilata girên Hemrînê li Rojavayê heta xêza ku ji çiyayê Sahendê - Masîr Abad - Bîçar - Esed Abad dirêj dibe li Rojhilatê; dawiyên wî yên başûrî bi xêza rêgaûbana (tevayîya rîyan) ku ji Qesrî Şîrîn - Kermanshah - Melayir dirêj dibe dikarin bên dest nîşan dan (tesbît kirin). Ev zarav di çar zaravên navçeyî de beş dibe:

1. **Mukrî:** Li Şîno - Neqade - Marga - Miyande - Wab - Şahîn Diz - Saqez - Bokan - Bane - Serdeşt.
2. **Soranî:** Li wilayeta Erbîlê li Iraqê (ji derveyî Qezayê Zîbarê). Navenda wî bajarê Erbîl e.
3. **Erdelanî:** Li Sine - Bîçar - Kinkor - Rewanser û Bakurê navçeyên Ciwanrû. Navenda wî bajarê Sanandaj (Sine) ye.
4. **Suleymanî:** Li wilayeta Suleymaniyê û hin navçeyên Xaneqînê li Iraqê.
5. **Germiyanî:** Ew ji yê Suleymaniyê ne pirr cihê ye. Li gel vê qasê, ev zarav navdar bû, bi hêzanî li navçeyên Kefrî-Kara Tepe - Kerkûkê li Iraqê.

(34) Ev destnîşandan hinek nêzîkî ya Edmonds e. Li Edmonds, C.J., berhema buhurî, rûpel 10 binêre.

Ev jî zaravekî kurdî ku li awhewayê ku ji riya sereke ya Qesrî Şîrîn - Kermansah - Melayir dirêj dibe li Bakur, heta kêlekên bakurî-rojhilatî yên Kendawê Erebfî li Başûr gelek fireh dibe ye. Û ev zarav e ku pê êlên lûrî yên kurdî, ku li vî awhewayê ku piraniya caran bi navê Lûristan tê nasîn rûdinên, dipeyivin. Loma hin nivîskar li vî zaravî navê zaravê lûrî dikan.

Lûr beşeke giring û resen (esfî) ji gelê kurd e. Şerefname dibêje ku sedema dayîna navê Lûr ji vî tofa (kom) êlên kurdî re ev e ku di wilayeta Manrûdê de gundekî bi navê Kurd hebû, û nêzîkî wî geliyekî ku jê re bi zaravê navçeyî Kol digotin hebû, û di vî geliyê de cihekî ku jê re Lûr dihat gotin hebû. Ev êl di destpêkê de li vî ciyê çêbûn û navê wî li wan hat kirin.

Dema ku jimara rûniştevanên vî geliyê bêtir bû, êlên wî derketin navçeyên hawsê. Loma ev êl bi navê "Lûrê rayî" (esfî) û "Lûrê Piçûk" tên nasîn. Lê êlên kurdî yên ku rûniştina wan a rayî li vî navçeyê, ango li geliyê Kol Manrûd ku me li jor got tu ne bû, lê ku ji navçeyine kurdî yên din derhatin vî awhewayî, ji êlên Lûrê Rayî nayên hesibandin. Û ji bo ku ew ji êlên Lûrê Rayî bîn cihê kirin navê "Lûrê Mezin" ji wan re hat dayîn.

Li ser vî bingeşê, êlên lûrî yên kurdî di du beşan de tên veqetandin:


1. Lûrê Mezin: Ew êlên Bextiyarî, Mamesanî û Kûhgilû ne. Ev êlên kurdî ku ji navçeyine din ên Kurdistanê derhatin vî awhewayî, di heyamên (dem) dîrokî yên cihê de, carna bi zorê û carna bi dilxwaziye, ne. Ew îro di nivê başûrî yê Lûristanê de rûdinên.

2. Lûrê Piçûk: Ew tofeke mezin a êlên kurdî ku li vî awhewayî ji demeke ku bi qasî kevnbûna gelê kurd bixwe kevnar e rûdinên e. Ji êlên wê yên nûjen ên navdartirîn Dilvan, Silsile, Balagirîwe û Amale li navçeya Pêş Kûh, û Feylî li Piştî Kûh, in.

Navê Feylî bi awakî giştî ji tofa êlên Lûrê Piçûk re dihat dayîn, û jê re digotin Feylî Lûr. Lê ev nav, ango Feylî, îro kême tê gotin, û eger bi kar bê jî bitenê ji êlên navçeya Piştî Kûh re tê gotin (35).

Zaravê kurmanciya başûrî di şaxên jêrîn de beş dibe:

- a) Lûriyê Rayî (yan Feylî) (36). b) Lekki
- c) Kelhûrî. d) Bextiyarî. e) Mamesanî.
- f) Kûhgilû.




(35) Ji bo hûriyên (tefsîl) bêtir li ser Lûr, Lûrê Mezin û Piçûk, binêre:

- 1- Bedlîsî Şeref Xan, berhema buhurî, wergerandina Muhammed Elî Ewnî, rûpel 24, 34; Rojbiyanî, rûpel 43, 56 û wergerandina kurdî, rûpel 61-62, 81-82.
- 2- Rawilson, Major, Notes on a march from Zahab..., J.R.G.S., cild 9, beş 1, 1839, rûpel 26-116.
- 3- Bischof (Mrs), Journey in Persia and Kurdistan, cild I, London, 1891, rûpel 95-297.
- 4- Curzon, George N., Persia and persian qustion, London, cild 2, 1892, rûpel 273-275.
- 5- Wilson, Arnold Talbet, Military report on S.W. Persia-Luristan, cild 5, Simla, 1912, rûpel 30.
- 6- Field, Henry, Contribution to Anthropology of Iran, 1939, rûpel 82-84, 173-184.

(36) Ji bo zanînen bêtir li ser navê Feylî, binêre:

- 1- Curzon, George N., berhema buhurî, rûpel 275-280.
- 2- Field, Henry, berhema buhurî, rûpel 178.
- 3- Douglas, William G., berhema buhurî, rûpel 95.



Lê Lekki zaravê ku pê êlên kurdî yên ku bi vî navî bixwe hatine nasîn û ku li navçeya Pêş Kûh a Lûristanê rûdinên dipeyivin e. Ji êlên wê, êlên Xewace Wend, Abd El-Malikî, Nadawend, Sûca, Xuşan û Katawend in. Hin êlên Dilvan, Silsile û Pîrawend jî ji Lekkan di destpêka vê sedsalê de nêzîkî 20.000 kes dihat hest kirin (texmîn) (37).

Kelhûrî pê êlên Kelhûr ên kurdî yên resen dipeyivin. Rawlinson jimara kesên wan di sala 1838 de 20.000 malî, ango nêzîkî 100.000 kes, hest kir. Nîvê wan li navçeyên cihê yên Farisistanê belav bûye, û yên mayîn li kelên xwe yên kevn, di himêza çiyayên Zagrosê de, rûdinên. Ji wan, heşa ku li navçeya Kermanshahê rûdinê di du şaxan de tê veqetandin: Şah Zade û Mansûrî. Jimara maliyên wan her du beşan bi rêz digihêje 8.000 û 2.000. Şah Zade destelata xwe daniye ser deştê Mahî Deşt ku ji Kermanshahê heta Mendelî dirêj dibe. Lê Mansûrî zewiyên (erd) wan li gora şaxa yekemîn

piçûk in. Ew li Başûrê Gîlanê rûdinên (38).

Bi vî awayî, her sê zaravên şaxî, Lûriyê Rayî, Lekki û Kelhûrî, li nîvê bakurî yê Lûristanê sereke ne.

Lê Bextiyarî zaravê ku êlên Bextiyarî yên kurdî yên navdar pê dipeyivin e. Ew jî beşeke giring ji êlên Lûrê Mezin in. Çavkanî dibêjin ku ev êl di nêzîkî 1106 de ji perçeyên bakurî yên Kurdistanê derhatin Lûristanê. Loma, ew ne ji Lûrên Rayî ne. Bextiyarî di du şaxan de beş dibin:

- Heftling** (heft êl yan ling). Ev beş îro 55 ling yan êl himêz dike. Ew li navçeyên goma çemê Karûnê rûdinên û piraniya wan koçer in.
- Çeharling** (çar êl yan ling). Ev tof îro 24 ling yan êlên piçûk himêz dike û li navçeya ku di navbera çemê Karûn û çemê Zalkî de ye rûdinê. Piraniya wan gundiyan şarewanî ne (ne koçer).

Stî Bischof jimara kesên êlên bextiyarî

(37) Wilson, Arnold Talbet, berhema buhurî, rûpel 14.

Field hebûna tofîne mezin ji êlên lekki li navçeya Qezwînê li Bakurê Îranê, ku destelatên (iktidar) îranî ew sirgûn û neçar (mecbûr) kirin ku li wê derê, ji welatê xwe dûr, rûnên, nîşan da. Jimara wan li Qezwînê 2.050 malî hat hest (texmîn) kirin. Êlên wan ên giringtirîn li wê derê ev in:

1- Koseler, 500 malî. 2- Yaricanlu, 400 malî. 3- Kara Koyunlu, 350 malî. 4- Yaramişlu, 300 malî. 5- Ali Kurtlu, 200 malî. 6- Ahmedlu, 200 malî. 7- Sanlu, Kutlu û Devletwend, 100 malî. Û ji wan ji 1000 malî bêtir li navçeyên Saqez û Leylaq û wilayetên Mazandiran û Faris hene. Li Field, Henry, berhema buhurî, rûpel 81, 72-75 binêre

(38) Rawlison, Major, berhema buhurî, rûpel 44. Li ser rayê Kelhûran binêre: The Encyclopaedia Britannica, A dictionary of Arts, Science, Literature. General information, 30th Edition, Vol. 15, p. 950.

di nêvên sedsala 19mîn de nêzîkî 29.100 malî hest kir. Û wê got jî ku ew di nîv-sedsalekê de, ango di nêzîkî sala 1890 de, gihajtin 23.288 malî. Ev jimar bê gûman mezin e (39).

Mamesanî zaravê êla Mamesanî ya kurdî ya navdar e. Curzon jimara kesên vê êlê di sala 1884 de 19.000 hest kir. Di jimar-tineke din de jimara wan 2.700 êl hat hest kirin. Navê vê êlê ji navê avakerê wê, Muhammed Hesên, hatiye.

Ev êla kurdî ku îro mezin e û ku li sînorên Başûrê Rojhilata Kurdistanê rûdinên van beşan himêz dike:

1. Bekşî: 1200 êl. 17 lingên wê hene.
2. Cûwî yan Cawîdî: 700 êl. 16 lingên wê hene.
3. Rustemî: 800 êl. Ji du tofan pêk tê:
 - a) Xan Elî Xan
 - b) Imam Qelî XanHer tof gend lingên wê hene (40).

Zaravê Kûhgilû zaravê êlên Kûhgilû yên kurdî ku li Başûrê navçeya bextiyarî û li dora çiyayê Dîna û kaniyên çemê Curahî heta Ram Hurmuz û Behbehanê rûdinên e. Li Roj-avaya wan Ereben Ehwezê rûdinên, û li Rojhilata wan êlên Mamesanî yên kurdî dirêj dibin.

Êlên Kûhgilû di du tofan de beş dibin:

- a) Tofa Piştî Kûh:
 - 1- Bûyir Ehmedî. 2- Duşmen Ziyarî.
 - 3- Seyid Riza Tewfîq. 4- Tabî Bilal.
 - 5- Tabî Bînî. 6- Tacî Tîbî. 7- Behmehî.
 - 8- Carûm Feşelyan. 9- Bawî. 10- Newî.
- b) Tofa Jîj Kûh:
 - 1- Axa Carî. 2- Begdalî. 3- Bawlî.

Her şax ji van şaxan tofeke lingên wê heye (41).

Dûmahî heye

(39) Bishop, Mrs, berhema buhurî, rûpel 294.

Li ser veqetandina Bextiyariyan di van her du beşan de sê dîtin hene:

- 1- Rayê êlê ji du biran tê. Yek ji wan heft û yê din çar zarokên wî hebûn.
- 2- Avakerê êlê zimalekî bi navê Bextiyar bû. Du jinên wî hebûn. Ji ya yekemîn heft zarokên wî çêbûn û ji wan şaxa Hefteling ava bû; û ji ya duyemîn çar zarokên wî çêbûn û ji wan şaxa Çareling çêbû. Ev dîtin a rasttirîn e.
- 3- Dîtina siyemîn dibêje ku ev êl di destpêkê de ne beşkirî bû. Lê rojekê, ji sedemên girêdayî êrîşan, wê xwe di du şaxan de beş kir. Di encama (netîce) şerrê ku wê kir yek ji du şaxan çar endamên xwe, û ya din heft hunda kirin. Û bi vî awayî, her du şax hatin nasîn.

Ji bo zanînen bêtir li ser Bextiyariyan, binêre:

1. Curzon, George N., berhema buhurî, rûpel 291.
2. Sawyer, Colonel H. A., The Bakhtiari Mountains and upper Elam, G.J., cild IV, N° 6, 1894, rûpel 501.
3. Wilson, Sir Arnold T., The Bakhtiaries, J.C.A.S., cild XII, beş III, 1926, rûpel 208-209.
4. Harnison, J.V., The Bakhtiari Country, G. J., cild LXXX, N° 3, 1933, rûpel 198.
5. Melkonian, Vantan, The Grass-folk: Notes on Bakhtiaries, The Faiha press, Basrah, 1940, rûpel 4.
6. The Encyclopaedia of Islam, cild I, Leiden, 1960, rûpel 955.
7. Patai, Raphael, Society, Culture and change in The Middle East, 3rd Edition, 1971, rûpel 224.

(40) 1. Curzon, George N., berhema buhurî, rûpel 318-319.

2. De Bode, The country of Mamasani and Kuhgilu, J.R.G.S., cild 13, beş I, 1843, rûpel 83.
3. Field, Henry, berhema buhurî, rûpel 22.

(41) 1. Curzon, George N., berhema buhurî.

2. Field, Henry, berhema buhurî, rûpel 204.
3. Military report on S.W. Persia (Kuhgilu country), cild IV, Simla, 1909.



PARLEMENTOYA EWRUPA

PÎRSA ERMENIYAN

Jaak VANDEMEULEBROUCKE (*)

P Ê Ş G O T I N

Herçend e li ser pîrsa Ermeniyên di van mehên dawîn de kêmtir axaftin jî girîngiya xwe ya dirokî diparêze.

Jaak Vandemeulebroucke, endamê Parlamanto ya Ewropa (ew flaman e û jî partiya Volksunie ye), li ser vê pîrsê raporeke heja amade kir û pêşkeşê komisyona rêzanî (siyasî) kir ku bi riya vê raporê Parlamanto ya Ewropa li ser vê pîrsa girîng raweste û biryarekê bistîne ku jê re çarekê bê dîtin.

Jaak Vandemeulebroucke di rapora xwe de cih dide iddiayên Tirkiyê yên fermî (resmî)

û gotina Ermeniyên bixwe. Li ser vê pîrsê, wî lêkolîneke heja çêkir û ev rapor bi alîkariya pirtûk, belge, rapor û lêkolînên dirokzanan pêk anî. Ji ber vê yekê, ev rapor cihekî girîng digire. Em jî bi kurtayî cih didine wê.

Weka ku tê zanîn, dewleta Tirkiyê û Ermenî li ser vê pîrsa girîng ne wek hev diaxivin. Her du alî di hemberê hev de ne. Dewleta Tirkiyê rastiya dirokî ya nijadkuji (qetlîam), pelixandin û sergûma vî gelî inkar dike. Hin rêxistinên rêzanî yên Ermeniyên bi awayê "terrorîzmê" têkoşîna xwe dikin û îtîrafa dewleta Tirkiyê dixwazin.

DIASPORA (**) ERMENIYAN

Pîrsa Ermeniyên cara pêşîn di Împeratoriya Osmanîyan de, di nîvê sedsala 19 de, dest pê kir. Cara duwemîn, nijadkujiyên mezin di destpêka sedsala 20 de bûn. Ji Ermeniyên ku di navbera van deman de û piştî nijadkujiyên dawîn di cihanê de di cihanê de belav bûn û li emniyeta xwe geriyên "diaspora ermenî" tê gotin. Li piraniya dewletên ku Ermenî tê de bi cih bûne ew wek "muhacir" hatin pejirandin (qebûl kirin). Li Tirkiyê nêzîkî 50.000 Ermenî dijîn.

Cidayî Ermeniyên Komara Ermenistanê li URSS, li gişê cihanê Ermenî weha belav bûne:

- 575.000 li Rojhilata Navîn (bi piranî li Lubnan, Sûriye û Îranê).
- 335.000 li Ewropa (bi piranî li Fransa).

- 600.000 li Emerîka Bakur (bi piranî li Yekîtiya Dewletên Emerîka, USA).
- 170.000 li Emerîka Latîn (bi piranî li Arjantin).
- 50.000 li dewletên din ên cihanê.

Ango "diaspora" ji nêzîkî 1.730.000 kes pêk hatiye.

Di rapora xwe de, Jaak Vandemeulebroucke dibêje ku Ermenî "netewê pêşvexistina abora dewleta Osmanî (Tirk) bû" û bi awakî mezin civakeke pêşketî bû.

Hem di dirokê de û hem di dema niha de Ermenî li welatê xwe û li derveyê wî hestê netewî (hîsa millî) diparêzin. Ew hest ji ol, ziman û çanda wan tê. Lê di eynî demê de ew pîr zû di civakên nuha de li xerîbiyê cihekê xwe distînin û danûstandinan xurt dikin.

HATINA NASYONALÎZMA TIRKAN

Di dawîya sedsala 18 û 19 de, gelek xwendekar û ronakbîrên Tirk li Fransa peyda

bûn. Wan kesan xwe bi tesîra azadî û pêşketina Rojava li hev dan hev û rêxistina

(*) Jaak Vandemeulebroucke, Ontwerp-Verslag Over Een Politieke Oplossing voor het Armeense Vraagstuk, PE 97.248/B. 26.6.1985. Wergerandin: hollandî-kurdî, û kurtenivîs: Derwêş

(**) Diaspora:gelê ku li derveyî welatê xwe belav bûye.

"Yekîti û Pêşveçûn" (Ittihad ve Terakki) ava kir. Amanca wan di nava dewleta Tirk de "wekhevîyê" bînin ku dewlet bi modela Rojava modern bibe.

Di aliyê din de zordestiya Abdul Hamid II li ser Ermenîyan û gelên din diwartir dibû. Di navbera salên 1908 û 1914 de, Bulgaristan û Yûnanistan li cem hin navçên din serxwebûna xwe îlan dikin.

SALÊN REŞ, RÊZANA HOV

Herçend e hikumeta dewleta Osmaniyan nûjen bûbe jî (jôn tirk li ser hikm in), ji flona 1914 û pê ve Ermenî di her alî de kontrol dibin. Hemî çekên Ermenîyan ji wan distînin, fermana kuştina her kesê ku çek nede dikeve destê leşkerê Tirk. Di 24.4.1915 de, bi fermana Talat Paşa komik û rêxistinên çandî-aborî û rêzanî yên Ermenîyan tînin girtin û merivên giring tînin heps kirin. 2345 mezinên Ermenî dikevin zîndanên dewleta Tirk.

Di tarîxa 26.5.1915 de, fermana dewletê (ya devkî) tê: Pêwîst e hemî Ermenî ji cihên xwe bên rakirin. Mêr, jin, xort, pîr û zarok divê tev cihên xwe biguherînin û li tu cihî jî jimara Ermenîyan ji 1/10 ji ya xelkê nebihure. Li tu bajarî divê Ermenî ji 50 malî bêtir nebin û nerûnin. Di tarîxa 27.5.1915 de, biryara girtin û malguhastina her kesê bigûman der dikeve.

Xwendekar û ronakbîrên Tirk jî hêdî hêdî geriyan û rêzana xwe li welatê xwe berdewam kir. Lê di bernama wan a rêxistina "Yekîti û Pêşveçûnê" de, di sala 1911 de, guhertinên giring çêdibin. Pişavtina (asîmilasyon) gelên din dibe amanca wan, ku Tirkîyeke bi tevayî Tirk ava bikin. Ev amancên ku li welatên Rojava dabûn pêş xwe ji bîr kirin û rêzaneke nuh ajotin.

Dewleta Tirk xwedîkirin û mezinkirina keçikên Ermenî yên bin 20 salî û xortên Ermenî yên bin 10 salî, ku bê bav û dê ne, werdigre. Hemî dibistan û xwendegehên Ermenîyan hatin girtin.

Ji Hezîrana 1915 ta destpêka 1917 dema ne xweş ji bo Ermenîyan dest pê kir. Li gora lêkolînan, 600.000 kes li welayetên Rojhilat hatin kuştin û hunda bûn. 600.000 kes jî di dema malguhastinê (sergûn) de di riyan de mirin. Ji gelê Ermenî bitenê 600.000 kes ji kuştin û mirina riyan serfiraz (xelas) bûn. Tiştêkî din ku pirr ecêb e: di tarîxa 20.4.1922 de, dewleta Tirk biryara destdanîna hemî mal û warê Ermenîyan ku bi darê zorê ji cihên wan rakirî da û di flona 1923 de jî vegera Ermenîyan ji bo gund û bajarên xwe (ji nava welêt û derveyî welêt) qedexa kir.

D A W Î

Tiştên ku di 1915-1917 de di hemberê Ermenîyan de bûn divê wek "jenosîd" (nijadkujî) bên pejirandin. Pêwîst e Parlemantoya Ewropa vê rastiya dîrokî bipejirîne û mafên merivan û gelan biparêze û pelixandinên weha û bisûcan mahkûm bike. Rast e ku meriv nikare sûcê nijadkujîya Ermenîyan ku dewleta Tirk berî 70 salan kir bavêje ser milê hikûmetên niha li Tirkîyê. Lê, hikûmetên niha di eynî dewletê de li ser hikm in û ew nijadkujî di wê dewletê de bi fermana (emr) wê dewletê bixwe bûye. Pêwîst e ev hikûmet vê rastiye bi awakî vekirî bipejirîne. Ev pejirandin bitenê di aliyê moral de baş e, û bi vê yekê Tirkîye kare gaveke baş ber bi îhtîrama mafê merivan di çarçewa internasyonal de bavêje. Di aliyê din de, ev pejirandin ewê rêzana hin rêxistinên Ermenîyan ku wek "terorîzm" tînin dîtin bide rawestan.

Di aliyê din de, ji ber ku dewletên din jî di wê dema nijadkujîyên Ermenîyan de

dengê xwe ne kir û ew nijadkujî ne dan rawestandî, hinek berpirsiyarî ji wê hovîtiyê li ser milên xwe hildigrin.

Ne bes e ku Yekîtiya Ewropa vê nijadkujîyê bizane. Pêwîst e ku her DEH dewletên Ewropa bi YEK dengî vê pirsê Ermenîyan di nava rêxistina Yekîtiya Netewan de biaxivin û li ser çaredîtina vê pirsê dîrokî rawestînin. Encex xebateke weha imkana çaredîtina rêzanî (siyasî) ya pirsê Ermenîyan paş 70 salan dide.

XEBATA ME

16 ÎLON

Wezîrê Karên Derve yê Tirkîyê, Halefoglu, hat Bruxelles ji bo ku bi wezîrên welatên ewrupî yên ku endamên C.E.E. (Komisyona Aborî ya Ewropî) ne bicive û li ser ketina Tirkîyê nav vê Komîsyonê bipeyive. Bi vê hincetê (munasebet), Têkoşer û kome-lên din ên kurd ku ji Almanya, Hollanda û Fransa hati bûn, tevî rêxistinên tirk, ermenî, yûnanî û C.N.A.P.D. (Comité National d'Action pour la Paix et le Développement) a belçîkî, li ber Parlamana Ewropa vê civînê protesto kir.

3 COTMEH

Rojnamevanê belçîkî, Marc Hoogsteys, ku di vê havînê de du mehan li Kurdistanê Îranê derbas kiri bû, li şareyariya (belediye) Wommel, bi alîkariya diyapozîtîvan, agahdariyeke hêja li ser têkoşîna Kurdan da. Têkoşer jî bi raxistina pirtûk û kasetên kurdî beşdar bû vê şevê. Ev rojnamevan çar gotarên dirêj (di her carê de 10 rûpel) di kovara hefteyî Topics de, li ser vê serdanê (ziyaret) nivîsîn.

8 COTMEH

Cardin Marc Hoogsteys li zanîngeha V.U.B. li Bruxelles, bi alîkariya diyapozîtîvan, axaftinekê li ser Kurdistanê Îranê kir. Em jî bi raxistina pirtûkan beşdar bûn.

11 û 12 COTMEH

Rêxistinên belçîkî û biyanî ku bû çend meh e li ser mafê helbijartinên şaredariyî (ên beledîyan) ji bo biyaniyan dicivin semîne-reke giring li ser vê babetê, li bajarê Namur, pêk anî. Di roja yekemîn de, me bîra (fîkr) xwe li ser vî mafî kûrtir kir, û di roja duyemîn de me bingeha bernameke pratîk a xebatê pêk anî. Di civînên mehî yên wêbê de, emê xebata xwe li gora vê bernamê bikin.

21 COTMEH

Têkoşer şeveke agahdariyê li ser Kurdistanê li Collège St-Louis, li bajarê Liège, pêk anî. Piştî axaftineke giştî li ser tevayîya Kurdistanê û dayîna bersivan, rojnamevan

Marc Hoogsteys cardin bi alîkariya diyapozîtîvan rewşa Kurdistanê Îranê darîçav kir. Piştî, me filma vidêo ya çandî "Kîne Em?" nîşan da. Ji derveyî vana, me pirtûk û kasetên kurdî raxistin. Bi vî awayî me her sê aliyên balkêş ên Kurdistanê dan nasîn: Dîrok, nûçeyên nuh û çand.

25 COTMEH

Rêxistinên aşîtiyê, C.N.A.P.D. û C.P.D., rojekê li ser aşîtiyê û dijî dayîna çekên atom li zanîngeha U.C.L. pêk anî. Me ji katjimêr (seet) 10 heta 18 pirtûk û kasetên kurdî raxistin.

15 MIJDAR

Piştî civînên mehî ku salekê ajot, rêxistinên belçîkî û biyanî yên ku li ser pirsên mirov û gelan radiwestin li "Maison de la Culture", li bajarê Namur, semînerê pêk anî. Piştî axaftina Profesor Bossuyt, serok-alîkarê Komisyona Mafên Mirovî li O.N.U. (Rêxistina Netewên Yekbûyî) û yên du kesên din li ber nêzîkî 50 kesan, em di du tofan (grup) de beş bûn: Tofa Agahdariyê û Tofa Fêrkirinê. Her tof jî katjimêr 11 heta 16.30 dûrûdirêj li ser bername û stratêjiya xebata xwe bîr kir (fikirî). Piştî, nûnerên her du tofan raporên dawîn li ber tevayîya beşdaran xwendin. Di civînên mehî yên wêbê de, emê li gora bingeha vê semînerê xebata pratîk dest pê bikin. Li eywana cihê semînerê gelek rêxistin pirtûk û belgeyên xwe raxistin.

DI MEHÊ DE CAREKÊ

- Civîn bi zanîngeha Aşîtiyê û rêxistinên din re, li ser mafên mirov û gelan.
- Civîn bi rêxistina M.R.A.X. û yên din re ji bo xwestina mafê helbijartinên şaredariyî ji biyaniyan re, di sala 1988 de.
- Civîn bi komelên civakî ku li şaredariya St-Josse, li Bruxelles, dixebitin.

DI HEFTÊ DE CAREKÊ

Radyoya azad: Her yekşem, ji katjimêr (seet) 13 heta 15.

TÊKOŞER'DEN HABERLER

16 EYLÜL

Türkiye Dışişleri Bakanı Halefoğlu, Avrupa Ekonomik Topluluğuna bağlı ülkelerin dışişleri bakanlarıyla toplantıya katılmak ve Türkiye'nin üyeliği konusunu görüşmek için Brüksel'e geldi. Bu münasebetle, Têkoşer ve Almanya, Hollanda ve Fransa'dan gelen diğer örgütler ile Türk, Ermeni, Yunan ve Belçika'dan C.N.A.P.D. (Comité National d'Action pour la Paix et le Développement) Avrupa Ekonomik Topluluğunun binası önünde bir protesto gösterisi yaptılar.

3 EKİM

İran Kürdistanı'nda iki aydan fazla kalan Belçika'lı gazeteci-fotoğrafçı Mark Hoogstyns, Wemmel belediyesinde Kürtlerin mücadelesi üzerine diaporitlerle beraber, detaylı ve ilginç bir konuşma yaptı. Têkoşer kitap ve müzik sergisi ile geceye katıldı. Adı geçen gazeteci-fotoğrafçı, Kürdistan gezisi ile ilgili izlenimlerini fotoğraflarla birlikte haftalık Topics dergisinin dört sayısında yayınladı.

8 EKİM

Yine Mark Hoogstyns, Brüksel Üniversitesi VUB'de diaporitleriyle İran Kürdistanı üzerine bir konuşma yaptı. Biz de sergimiz ile katıldık.

11 ve 12 EKİM

Göçmen işçilerin belediye seçimlerinde oy hakları üzerine uzun bir zamandan beri toplanan Belçika'lı ve yabancı örgütler Namur şehrinde önemli bir seminer düzenlediler. Birinci günde sorun detaylı bir şekilde konuşuldu, ikinci günde ise, hayata geçirilecek bir programın temeli hazırlandı. Bu program gelecekte yapılacak çalışmaların temelini oluşturacak.

21 EKİM

Têkoşer, Liège'te, St-Louis Koleji'nde bir bilgiyön gecesi düzenledi. Genel bir konuşma yapıldıktan sonra sorulan sorulara cevap verildi. Gecenin ikinci bölümünde

gazeteci Mark Hoogstyns, diaporitleriyle beraber İran Kürdistanı üzerine bir açıklama yaptı. Konuşmalardan sonra "Kî ne em" video filmi gösterildi. Kitap sergisi açıldı. Böylece Kürdistan'ın aktüel üç parçasını, tarih, kültür ve sosyal yaşantısını tanıttık.

22 EKİM

Barış örgütü C.N.A.P.D. ve C.P.D. barış için atom silahlarına karşı bir günlük eylem düzenlediler. Brüksel Üniversitesi UCL'de olan bu güne sergimiz ile katıldık.

15 KASIM

İnsan ve Halkların hakları sorunu üzerine çalışma yapan belçika'lı ve yabancı örgütler, bir aylık arayla yapılan toplantılardan sonra, Namur'da, "Maison de la Culture" binasında bir seminer yaptı. Profesör Bos-suyt'ün konuşmasından sonra Birleşmiş Milletler Örgütü'ne bağlı İnsan Hakları Komisyonu başkanı ve iki başka konuşmacıdan sonra aşağı yukarı 50'şer kişiden oluşan iki gruba ayrıldık: bilgiyön ve eğitim grupları. Her grup saat 11 de 16.30 a kadar kendi programı ve stratejisi üzerine tartıştı. Toplantıların netice notları tüm katılanların önünde okundu. Gelecekte bu seminerde kararlaştırılan programa göre pratik çalışmalar olacak. Seminer salonunda çeşitli örgütler sergilerini açmışlardı.

AYDA BİR

- Barış Üniversitesi ve çeşitli kuruluşlarla beraber insan ve halkların hakları üzerine yapılan toplantı.
- MRAX ve bazı kuruluşlar ile yabancılardan 1988 belediye seçim hakları üzerine toplantı.
- St.-Josse-Brüksel Kültürel Örgütleri ile toplantı.

HAFTADA BİR

- Serbest Radyo: Her pazar günü saat 13'ten 15'e kadar süren radyo yayını.

KURDISTAN

*INFORMATION - DEBAT

*FILM CULTUREL (VIDEO)

*STAND D'INFORMATION

MARDI , 21.10.1986 , - 20 h

COLLEGE ST-LOUIS , RUE VILLETTE , 28 - 4020 LIEGE

(CENTRE COMMERCIAL DE LONGDOZ)

ORGANISATEUR : **TÊKOŞER** | union des travailleurs et étudiants
kurdes en belgique |

ENTREE : 50 f.b.

